





Rıza Çolpan

Destana Diroka  
Kurd û Kurdistan

AGADARÎ

Xwendevanê Berêz,

Berê ku tu bikevi nav rûpelên ev pirtûkê, ez dixwazim li te bîdim zanin, ku mîn li şûna tipa î a bî kullî ev: i, li şûna tipa bêt kullî ji ev, tip :1 , ango ev bikar ani. Ji bona ev ji divê tu mîn biborine.

## **Weşanen Dersım**

**Çapa Yekemin Dirok 1992**

**Printed by Art Offset  
Melbourne Australia 1992**

All rights reserved.

**Wenê ê lı ser pirtûkê û ên lı  
rûpelên pirtukê de Hasan Bağdas**

**Navnişana Xwestinê  
33 Villiers St, Merrylands  
NSW 2160 Australia**

## NAVEROK

Babetên ku li hundrê ev pirtûkêdane

Çiroka Bav û Dayika Gelê Kurd, Ewên  
Heri Kevn, Kurdo û werdê

Pêxwamberê Kurd "Zerdeşt" û Ol' a "Zerdeşt"

Kurê Kurd Rustem ' ê Zal

Çiroka Memê Alan û Zimê

Ferhat û Şirin

Derketina Hukma Asûr, Tevgera "Kawa" ê  
Hesinkar û gelê Ari - 600 sal B.Z.

Derketina Qiralê Yewnan, Îskendere Mezin - 331 sal B.Z.

Derketina Ol'a Îslam, Rewşa Gelê Kurd û  
Pejrandina Ol'a Îslam - 612 sal P.Z.

Dewleta Hewnewi û Şadadi - 941-951 sal P.Z.

Dewleta Kurd a Merwani - 984 sal P.Z.

Derketina Tırkan - 1071 sal P.Z.

Dewleta Eyûbi - 1174 sal P.Z.

Derketina Dewleta Osmanli - 1300 sal P.Z.

Çend Wêjevanên Diroki Lı Pıstı Qurna 12' an

Serê Kela "Dımdım"

Serihıldana Şêx Ubedullah - 1800 sal P.Z.

Şerê Cihan' ê Yekemin - 1914 sal P.Z.

Derketuna Mîstefa Kemal - 1919 sal P.Z.

Serihıldana Şêx Mamût Berzanci - 1919 sal P.Z.

Peymana Sewrê - 1920 sal P.Z.

Komelên Kurd, Serihıldan û Tevkustuna  
"Qoçkiryê" - 1920 sal P.Z.

Lı Qurna Bistan De, Çend Tevgerên Kurdistan' a  
Îran û Iraq' ê - 1920-1922 sal P.Z.

Peymana Lozanê - 1923 sal P.Z.

Pırsa Kurd Lı Rojev ' a Meclisa Tırk de - 1923 sal P.Z.

Serihıldana Şêx Said - 1925 sal P.Z.

Serihıldana Çiya ê Agırê - 1926-1929 sal P.Z.

Tevkuştuna Dêrsim- 1937-1938 sal P.Z.

Si û Sê Guleyên Dıjmun - 1943 sal P.Z.

Komara Mehabatê û Xurandına Komarê -  
1946-1947 sal P.Z.

Bûyera Çıl Nehan (49) - 1959 sal P.Z.

Pısti Salên 1950' an Kurdistan' a Îran û Iraq

Gotun û Peyvên

## PEŞGOTINA NIVIŞKAR

Xwendavanê hêja,

Berî hemû tûst ez dîxwazim hina ku tu ne ketiyî nav xwendina rûpelên vê "Deştana Dîroka Kurd û Kurdistan " xwe li te bîdim naskirin.

Belê, bêt pesn û bêt derew, ez ne miroveki ku li Dîbistanên bîlind de xwendiyê û Zanîngehên mezînan kuta kiriyê bûye xudan Buruntî-ango Diploma-ew kes nînim. Mîn wexta ku çavên xwe li Cihanê vakar, ez li Cihanê nêhêriyam, mîn dit ku ez kureki Kurd, layê miroveki hejar, belangaz, kedkar û zametkêşim. Bavê mîn li herêma Dêrsîm, qeza Mêzgir, lîwa Moxîndî, li gundê Kûpîkê de ji seyîdan ra colegtî dîkir. Malbata me, malbatek li eşîra Îzol'ane. Bapîrê mîn li zarokatiya xwe de sêwi maye, ew li qeza Depê, li gundê Xelanê Gazê de rabûye hatiye li gundê Kûpîkê ligel seyîdan de ciwar bûye. Bavê mîn jiyane xwe û dolîw'a xwe a malbati bî colegtî berdewam dîkir.

Lî sala 1946'an de-ku ez li wê heyamê de 9-10 salîni bûm-Cendermeyên Romê hatin gundê me, ji bavê mînra gotin "tu yan layê xwe dîşîni Dîbistanê û yan ji 150 Pangînot drav ceza dîdî". Bavê mînê hejar û reben, nedîkarîbû ku ew 150 Pangînot drav ceza bîde hukma Romê, mîn neşîne Dîbîstana dîjmîn. Lê bavê mînê dîlovan bêt havîl ma û wi ez şandim dîbîstana dîjmîn bêt Pîrtûk û Pênûs.

Mîn Dîbîstana ewlîni, a dîjmîn heya dawiyê, bî gelek zamet û dijwarîva xwend. Lê li dawîya rojên kutabûnê de, ji bona Nîfûs derxîstûnê. Wêne ê ji bona Buruntî'yê bavê mîn 50 gurîş'ê wi zemani nedît ku bîde mîn, ez Buruntî a Dîbîstana'a ewlîni bîstînim. Ji bona sebêba xîzaniya aborîyê mîn Buruntî nestand. Evê ew bû sebêba nexwendîna mîn.

Pîştî wê rojê de ez bûm terki welat û ketim kûçeyên bajarên dewleta Tîrk. Lê ez li wan bajarên dîjmîn de vala nesekîniyam û mîn çî pîrtûk ditin û çî Pîrtûk ketin destên mîn, mîn ew hemû bî zewq û kêf bêt westan xwendin.

Ez lı zarotiya xwe de bengiyê xwendinê bûm, heya roja iro ji ew bengiya min berde wame. Çı dıxwazım bêjim, ango min perwerde û zanyariya xwe, lı Dıbistan'an de, lı ba Mamosta'en nav û deng de nedıt. Lê min perwerde û zanyariya xwe lı nav gel û kesên zana de dit û ev her du faktor bûn Mamoste'ên min.

Çawa ku têt zanin, lı Tırkiyê de hebûna gelê Kurd qedexe bû. Min lı hemû jiyana xwe a Tırkiyê de, qet xetek nıvısa zımanê Kurdi nedıt bû û min qe: ji nedızanı bû ku, Dırok, Çand, Zargotın û Wêje a gelê Kurd ji heye, ev gela ji xudan henûnên xwe'ên Dırokiye.

Belê, min heya sala 1962' yan de, qet lı derheqa Dırok, Çand, Zargotın û Wêje a gelê xwe de çu tıstek nedızanı bû. Pışti wan salan de ez hêdi-hêdi şıyar dı bûm; lê disa ji, min ji xwera riek herê qenc, dırist û rast nedıdit, ez lı ser Dıroka gelê xwe de nezan bûm.

Lı sala 1966'an de, ez çûm Almanya, bajarê Hambûrg'e. Cara yekem min lı Hambûrg'ê pırtûka Dıroka Kurd, bı zımanê Almanı dit. Lê sed mıxabe ku, min zımanê Almanı nedızanı bû, ez iro ji nızanı m. Bêt guman û bêt derew, çekûçê yekem lı wê şalê de lı serê min ket. Ez lı Almanya de nêzıka sêçar mehan mam û dûra dagerıyam Tırkiyê.

Lı sala 1970, meha Çıle ê Paşın de, min sê zarokên xwe û xêzana xwe, ango bermaliye xwe, şuva hiştın û ez hatım lı Awıstûralya de ciwar bûm. Pışti heft mehan de kar bıdesta Awıstûralya zarokên min ji anin ba min. Ez êdi lı walateki Aza û Demoqrata de dijıyam, ji bona xwendın û nıfısandınê, ji bona mabest û ramanên mırov ji, qet qedexeeke ji tune bû û tune ji. Ev ji, ji bona min navçeeke baş û herê grıng bû.

Belê, lê ez vala nesekınıyam. Lı Awıstûralya de, lı ser lêgerandın û lêkolandına Dıroka gelê Kurd de, bêtır bergehên min fereh bûn. Min êdi xebata xwe a Netewi ji kır nav xebatên çınayeti û bızavi destpêka kar kır. Ez bûm ew kesê yekem ku lı Awıstûralya de, karkerên Tırk û Kurd lı ser rêça çınayetiye de rêz kır.



Lê divê mirov bî dîrstî rast bibêje, berî ku em xwe nasbîkîn, bîbîn Kurd, rewşa gelê xwe û doza gelê xwe bîzanîn, em bûn Sosyalist û Kominist. Lî berî Azadbûna Kurdistan'ê , lî berî şikandîna olqên-zincir-bîndestiyê û Rîzgariya welat, me kar û berên tekosîna şoreşa "Proleterya" dîkîr. Me kar û xebata felatbûna bîndestiyê, xebata Rîzgariya Kurdistan, Kurdistan'ek Azad û Demokrat, jî xwe birakiribû û me jî bona welatê xwe karnedîkîr, em lî doza welat geleki dûrva mabûn. Wexta ku em tîşteki lî xwe hesiyân jî, me xebata Rîzgariya walêt kîr bernama rojev'a duwemin.

Herwaha, piştî sala 1977' an de, ez bêtr hatim guhartin û bûm hevalê hêzên Kurdistan; ew hêzên ku lî Ewrûpa hatibûn demazirandin - iro jî disa gelek hêzên welatparêz lî Ewrûpa' ne - jî bona doza welêt kardîkîrîn, iro jî karên wanên hêja berdewame.

Piştî gelek hewl dayînê de, mîn dit ku lî Awîstûralya de, şoreş a "Proleterya" xem û xeyale, jî bona Tirkîyê jî, her usa wergeye. Lî wê salê de mîn kar û berên lî tev Tîrkan hêdi-hêdi berda û ez êdi ketim nav cîvaka Kurdên Sydney, mîn destpêka xebata rêzkîrîna gelê xwe kîr. Jî bona ev kar û xebatên mîn jî, gelek bûyer lî serê mîn qewîmîn; Tîrkên Faşîst û nijadperest, jî mînra ducar kuştînzwazî çêkîrîn, Karbîdesta Awîstûralya lî ev tîşt hesiya û gelek teşqele çebûn, ez ketim bin parastîna polîsên Awîstûralya.

Bele, roj hat gihîşt sala 1979'an. 29-1-1979'an de, mîn "Komela Kurdên Awîstûralya" tev gelek Kurdperwerên Kurdistan sazîkîr. Piştî demazirandîna komelê, me serî lî Karbîdesta Awîstûralya xîst û Dewleta Awîstûralya cîvaka Kurdên ku lî welatê wan de dijîn, ew jî mîna hemû etnikên din, etnikêk pejîrand û Çanda gelê me Kurdan jî kete nav pîrr çandîya Awîstûralya.

Piştî wê rojê de, peywendiyên mîn bî bêtr lî hêzên Kurdistan va hate girêdan û ez bûm hevalê hêzên Kurdistan. Lî Almanya, wek "Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan, KOMKAR", Kovara Federasyonê "Dengê KOMKAR", Kovara rêkxîraba "Mala Gelê Kurd", "Gazîna Welat", "Roja Nû", "Rîzgariya Kurdistan" her mehe jî mînra dîhatin.

Cara yekem bû ku mîn nîvîsa zîmanê Kurdî lî evan Kovaran de dit û

mîn hewl da ku, rojeki bî zû ez xwendin û nîvîsandîna gelê xwe fêrbîm, zîmanê xwe serast bîkîm û roj bî roj pêşva bîbîm. Lê ez bêt pesn û bêt derew bêjîm, mîn ew kara kîr û zîmanê dayîka xwe tîsteki bêtîr hînkîr û ez fêre xwendin û nîvîsandîna zîmanê dayîkê bûm. Dûra êdî çîqas ku pîrtûkên zîmanê Kurdî gihîştin destê mîn, mîn ew hemu bêt westan, dubar-dubar xwendin, lî ber çav derbaz kîrîn.

Çî pîrtûken ku bî zîmanê Kurdî û Tîrkî lî ser dîroka gelê Kurd û Kurdîstan hatîne nîvîsin û mîn ew dîtîne, ew jî xwendin û ez lî ser Dîrok, Wêje, Çand, Zargotîn û hemû kevneşopîyên gelê xwe, serwext û agadar bûm. Ez nîkarîbîm bejîm " zîmanê mîn pîrîr başe, an jî ez mîrovekî zîmanzanîm. " Na, lê ez dîkarîbîm bêjîm "Xwedê şîkîr îro ez lî duhu bêtîr zîmanê dayîka xwe dîzanîm, bûme nasê Dîroka gelê xwe, bî zîmanê dayîka xwe dîxwînim û dînîvîsînim. " Helbest nîvîsandîna mîn jî, lî zarokatiya mîn da destpêdîke. Lî nav gelê xwe de ez helbestvanekî piçûkîm.

Xwendevanê hêja,

Ev pîrtûka ku lî destê tedaye, a " Destana Dîroka Kurd û Kurdîstan " xebatek mîna dûr û dirêje. Gelek zeman bû ku, lî mêjo ê mîn de xebatek usa hebû. Mîn dîgot "gelo ez çawa bîkîm ku, helbesta" Dîroka Kurd û Kurdîstan " bînîvîsînim". Lî dawîyê de, mîn bîryar stand ku, ez qasa zanîna xwe, qasa ku mîn dîroka "Kurd û Kurdîstan" xwendîye, qasa ku ew serihîldan û bûyerên ku lî welatê mîn de qewîmîyane dîzanîm, qasa ku ez Hozan û Helbestvanên gelê xwe-ewên kevn û kîlasîk- nasdîkîm, lî derheqa ewana û hemû tîştan de, yek û yek bînîvîsînim. Mîn werge jî kîr û despêka nîvîsandîna ev " Karpêk" a xwe kîr.

Jî bona ev xebata mîn jî, ez bawerîm kesek nîkarîbe ku bîbêje " welleh ev xebat û 'Karpêk' bêt qîsûr û bêt kêmasîye" . Na, ez bî xwe jî tîsteki usa nabejîm. Çawa ku mîn lî jor de jî got, " ez bî xwe Kedkarek û Hozanekî Kurd' ê piçûkîm. Mîn ev "Karpêk" ango aferîn'dîna xwe, qasa zanîn û perwerde a xwe amadekîriye û nîvîsîndîye. Hêviya mîn ewe ku, lî pêşerojan de, Kurdîstan' ek Aza, Demokrat, Serbîxwe û Şareza ' de , newîyê me Kurdên bîndest, tîlî lî ser ev kêmasî û qîsûrê me yê nîvîsî dîn. Evana serast û nûjen bîkîn .

Mın lı dilda pırr dıxwast ku, ez bı xwe ji wê rojê bîbinım; lê çı kêre ku jina mirov lı nav jina ev " Xweza" de pırr kine û jina mirov qet têra dituna gelek tıstan nake. Lı gor rewş û wextek roja iroyin de, ez dıfıkırım û dıbinım ji, ku jina mın, ji bona ev hevîyê û ditunê, werqas durêj nîne. Ji lewra dijminê me geleki xurt û bı hezn. Ew ji bona pırsa Kurd û Kurdistan ji, her tim ji hewra hevparın. Hêzên gelê Kurd ji, perçe-perçe ne û her yek ji, ji bona birûbaweri û rêzaniya xwe xebat dıkn, guh nadın hevûdu, ji bona rawestên nıqteên -hevpar de nayên ba hev û yekitiyek xurt, yekitiyek bıratı, yekitiyek rêk û pêk, pêk nayın. Helbet ev hêzên "Netewa Kurd" her tim usa nasekının, wê rewş ji usa nemese; wê roj bê hemû serok û rêberên Kurdistan ji xwe biguhêrinın, guhdare hevûdu bıkn, serê wan ji lı darên trbên wankeve û ew ji, ji bona maf û berjewendiya gelê xwe bêne ba hev û wê yekitiya xem û xeyalên gelê Kurd, wê yekitya bıratı pêk binın û Kurdistan ' a bındest Azad, dilê gel ji şah bıkn.

Lı aliya dın de, rêzkırına babetan û rêzkırına qewımandın û bûyerên Diroke de disa bıbe ku kêmasiên mın hebın. Lê dıvê ew ji, lı pêperojan de, bı zımaneki zil û zelal va bêne serastkırın.

Çawa ku hûn ji dızanın, Diroka Kurd û Kurdistan, Dirokek herê kevine, koka Diroka gelê Kurd ji dıgêhêje çend hezar salên bıhuri. Lê sed mıxabın ku, lı derketına ol a İslam, êrişên barbar artêşên-ordiyên-İslam de, derketına Cengızxan' e Moxol, bıraê Moxol Tırk' ên har û hov de, hemû hebûna gelê me, hemû hêjai yên me hatın şewıtandın û hatın şêlandın, hatın pelçiqandın. Wana welatê me talan, Diroka me betal, pergala me belav kırın. Çı ku gelê Kurd û Diroka gelê Kurd dıda naskırın, dıda temaşekırın û dıani ber çavan, wana ew hemû şewıtandın, wenda kırın, şıkandın, kırın rewşek herê xırab û nenaskiri. Ji bona ev ji mirov nıkarıbe sedi-sed bıbêje " ev raste, ev derewe." Lê tıstê ku sedi-sed raste, ew ji iro hebûna gelê Kurde; hejmara nıfûsa gelê Kurd ji, gihiştiye si (30) milyoni. Ev ji rewşek objektif û berbı çave; ev milyonana ji, dibên "em ne Farıs, ne Erebe û ne ji Tırk' ın." Lê bıla Tırk' ên nıjadperest çıqas dıbêjn, çıqas dıqırın, bıla bigırın û bıbêjn ku " Kurd, Tırk' en çıyanın û bınkoka Çand û zımanê Kurd ji, lı bıkn koka zıman û çanda Tırk' va tê." Erebe bêjn "eslê gelê Kurd, lı eslê Erebe tê". Farıs ji bıbêjn "gelê Kurd lı eşırek Farıs ' da peyda bûye " fılan-bêvan. Bı van gotnan Kûçık û refên Rovi' yan bile dıkenın û qet guhdare wan nıjadperestan nakın.

Dirokzanên Cihan, jî bona Diroka gelê Kurd, du (2) ditun û raman anîne ber çavan. Ditun û ramana yekemin ewe. Yek: Lî gor Dirokzanan, Kurd lî bakûra Ewrûê, lî nav eşîrên Cermenan-Alman-lî aliya welatên Iskandinavya de derketine-hatine aliya Qafqasya û lî wê jî hatine Rojhûlata Navin, lî ser erdê Mezopotamya, lî navbera çemê Dicle û Fîrat de cîwar bûne. Raman û ditna duwemin: Disa hûn Dirokzan dibêjin ku "Kurd dimatîyên erdê Mezopotamyane, qet lî çiyekî dîn de derketine, nehatine ser erdê Kurdistan' a iroin. Ev gel mîna reşîkên Awistûralya "Aborigine" çerm sorên Emriki, dimatîyên wî erdine, fîlan û bêvan. Ango ditun û ramanên herê giring evin. Pîştî hemû ev raman û ditnan de, bî rasti mîrov nîkarîbe ku bibeje "şedi-sed, ev raste, ew ne raste, derewe." Lê tîştê ku raste, ew jî-çawa ku mîn lî jorda jî got iro hebûna gelê Kurde, hebûna Netewekî si (30) milyone; eva, eve rasti.

Lî gor birûbawerîyên mîn jî, gelê Kurd dimatîyê erdê Mezopotomya' yê ye; berî: Ereb, Sumer, Akad, Hitit, Asûr û gelek gel û Netewên dîn de, lî ser wî erdî jiyaye, bî Nîjad û bînkoka xwe va Ariye, newiyê Med' e.

Lî aliya dîn de, lî nav gel de têt gotin ku, navê bav û dayika gelê Kurd-ewên pêşîn- Kurdo û Werdê' ye, jî zarokên wan' ra jî gotine "keç û kurên Kurdo û Werdê "Jî bona ev jî, jî gelê Kurd' ra gotine Kurd ." Jî bona ev bawerîyê ye ku, mîn lî destpêka ev "Karpêk", anga aferîn ' ek a xwe de, Kurdo û Werdê kîre rêz û babeta yekemin. Lî gor gotinên bav û kalan, ew lî ser erdê Botan' ê de welidîne û lî ser wî erdî de hevûdu ditine, lî wê zewicîyane û newiyên wan em jî, lihatine gihiştine ev roja iroin û dawîya qurna bîstan.

Lî bîlî ev, Diroka Cihan ' ê qenc dîde zanîn û xuyakirîn ku, lî destpêka derketina Çîn û çinayetiyan de, serdest û bîndestiyan de, mîrov jî xwera gelek jî, Xwedê afirandiye. Çî ku lî xwe hêztir, xurtir ditiye, ew jî xwera kîriye Xwedê; an jî Ziyaretgeh. Ango mîrov bî sedan jî xwe ra Xwedê afirandiye. Pîştî sedhezâr salên bîhuri de, mîrovatiya Cihan lî ser yek Xwedê ' yekî de bîryar standiye û gotiye "Xwedê yeke" û yek Xwedê afirandiye. Mîrov lî Cihan, Gerdûn û Xweza nihêriye, dûra gotiye "gelo ev Esmân, ev Cihan, Gerdûn, Erd û Behr' en Cihan, Çem, Kani, Dest û hemû hebûnen darîngî-maddî-kê afirandiye?

Pışti ev pırs, ditın û hışaninên ev tıstana, aqlê mirov negihîştîye afirandın û hebûnê ev tıstên berbı çav. Pışti sedhezaran sal gotiye "Xwedê ev tıstana afirandine, Xwedê yeke, ne duduye." Dûra, ji bona ev raman û baweriyân, hın kes derketine û xwe kırine dilçe balyozê Xwedê, xwe Pêxamber aşkar kırine, xwe li gel û cıvakan werge dane naskırın. Wana birûbaweri ' yên xwe ji, ji bona cıvaka xwe û Cihanê rêzkırine û bı zora Şûr, Mertal û kuştinê dane pejırandın. Ew roj, ev roj, Ol li destên serdestan de, bûye Şûr li ser stuyê hejar û belengazan de û gelên bındest de maye. Li nav hemû ol' ên Cihan ' de, Ol' ek ji Ol' a "ZERDEŞT" e. Zerdest bı xwe ji, miroveki Kurde. Wi hemû baweri' yên xwe ' ên Ol' i ji-gor ku tête gotın-lı ser Danzdeh hezar (12 000) çermên heywanan de nıvısiye, li gelê xwe û hın gelek-gelên Rojhılata Navın, daye pejırandın. Lê sed mıxabın ku, li destpêka derketına Ol'a Xaçparêz ' an û êrişên wan de, li derketına Ol' a İslam û êrişên wanên barbari de, li derketına qiralê Moxol Cengızxan, kok nıjadên Moxol Tırk' ên har û hov de, Ol' a ZERDEŞT, pırtûka Zerdest ' ZEND AVESTE" hemû hatın şewıtandın û gelê Kurd ji bı zora Şûr kırın İslam, kırın Xaçparêz, kırın Yahûd hwd. Lê li dawiyê de, gor Erdnıgara-Coxrafya- gelê Kurd, pıraniya gelê Kurd bêt havıl man û bûn İslam. Pışti ev ji, gelê Kurd Ol' a xwe a kevn, a bav û kalan, birkır, serda ji bû dijminê Ol'a xwe, Pêxamber ' ê xwe ZERDEŞ û YEZİDİXAN. Ev herdu ji newiyê Kurdo û Werdê bûn.

Rêza şeyem de, mın bı kurtasi mêrxwas û Lehengê gelê Kurd, ewê Dıroki Rustem' ê ZAL daye naskırın. Rustem' ê ZAL pelexan û lehengeki Kurde. Lê sed mıxabın ku, Roma Reş, ango Tırk' ên har û hov, li wi ji xwedi derkeine û ew newiyê Kurdo, Tırk dane naskırın, gotine "Rustem' ê ZAL Pelexaneki Tırk' ê." Li ser mêrxwasiya wi Lehengê gelê Kurd, pırtûk ji nıvısandine, Rustem kırine Tırk. Lê bı rasti çu peywendiyê Rustem li nıjada Tırk' ra tune, ew kureki Kurde.

Babeta çaran: mın çiroka "Memê ALAN û Zinê " aniye ber çavan; bı kurtasi li ser evına wan sekınıyame, ew evına wan aniye zıman, nıvısandıye. Ez bawerım gelê Kurd wê evına "Mem û Zinê" baş dızane. Ew herdu bêtmırazên Kurd, li nav gelê xwe de, bûne nemır û çiroka evına wan ji, ji bona gelê Kurd bûye Destanek Dıroki û kılasiq.

Pısti ciroka " Mem û Zinê" mın çend xet ji, ji bona evina " Ferhat û Şirin" nıvısandıye ew dane naskırın. Lê disa sed mıxabın ku, Tırk'ên har û bêt fedi lı wan ji xwedi derketıne, gotına " Ferhat û Şirin" ew keç kurê Tırk'ın.

Lı pey evana, mın derketına hukma Asur û qiralê Asur Dehaq'ê xwinmıj, Şêr û merxwasê gelê Kurd "KAWA" ê hesınkar, Tevger û mêrxasiya wi kırıye babeta xwe, lı ser wê mitelojiya diroki sakınıyame. Pısti ev, ez dageryame derketına qiralê Yewnan, ewê nav û deng Iskender' ê mezin û êrişên Farıs' ên bêbext, xurandına Dewleta Kurd, imparatora "MED" û lı holê rakırına Dewlata MED. Dûra ez dageriyame ser derketına Ol'a islam û barbariyên Ol'a islam; islam'i bı çı tehri û bı çı şekli lı gelê Kurd dane pejrırandın û gelê Kurd çawa bûye islam. Ez hêvi dıkım xwendevanên ev pirtûka mın lı wan bêbextiyan bawer bıkın. Jı ber ku ew barbariyana hemû hatne serê gelê Kurd û Kurd bı wi şekli va bûne islam. Lı pey pejrırandına Ol'a islam ji, hemû islam'ên dorbera Erdnıgariya gelê Kurd, hemû bûne dijminê gelê Kurd, nehiştıne ku gelê Kurd ji serê xwe rake û welatê xwe Azad ke, lı bın destan de felat bıbe, heqê xwe ê çarenûsi bıstıne, Dewleta xwe saz bıke.

Lı pey ev babetana, mın bı kurtasi qal û behsa Dewleta Kurd, a "MÉRWANı" lı dû ev derketın Tırkan, Dewleta Kurd, "Zengi û Eyûbi", Dewleta Kurd, "Hesnewi û Şadadi " kırıye. Disa lı pey evana, mın qal û behsa derketına Dewleta Osmanlı kırıye, lı ser Dewleta Osmanlı sekınıyame û mın ew daye naskırın, qasa zanına xwe.

Pısti evana mın çend xet ji, ji bona Wêjewanên Kurd, ewên Dıroki û kılasiq nıvısandıye û ew hêja'ên gelê Kurd danenaskırın; ne bı dirêji, lê bı kurtasi. Lı wê ez daketıme ser serê "Kela DIMDIM" û barbariya hukma İnan, Şah Abas'ê hov, mêrxwasiya "Xano'ê Cengzêrin". Mın çend xet ji, lı ser wê serihıldanê nıvısandıye. Lı dû ev ez hatıme ser serihıldana "Şêx Ubeydulla û Yêzdan Şêr" û gihıştıme şerê Cihan'a yekemin û derketına Mistefa Kemal'ê har û hov.

Lı pey ev, ez lı ser peymanı "SEWR"ê sekınime û mın qal û behsa Şerif Paşa kırıye. Lı wê dageryame ser demazırandına Komel'ên

Kurd, tevkuştina Qoçkiri'yê; peymanana Lozan; ê, pîrsa Kurd li rojev'a meclisa Tirk'an de; Têvger û serihıldanên Kurdistan'a İran û Iraq'ê. Mîna ew babetana kîrîna rojev'a xwe û li ser wan sekîniyame. Lî pey evana ez hat'me hihîştîme serihıldana Şêx Said, Çiya'ê Agır, Tevkuştina Dêrsım, Komara Mahabat, bûyera Çıl Nehan, Si û sê guleyên dijmin. Lî piştî salên 1950'i lî Kurdistan'a İran û Iraq sekînimê û mîna, ew buyerana hemû anîne zıman û qal û behsa peymanana Cezayirê kîrîye û dawî daye ew babetên Dîroki.

Min ew tevkuştina "HELEPÇE" û bûyerên piştî şerê Xelîcê, nekîrî nav ew babetên dîna. Ji ber ku, mîna lî bona wan herdu bûyerên Dîroki barbarîya SADDAM'ê Faşîst'ê hov, bî cudai nîvîsandiye û ez hêvî dîkîm lî pêşerojandê, wan helbestên xwe bî pirtûkek cûdai de bîdîm weşandî û bîgihîjinîm destê xwendvanên Kurd.

RIZA ÇOLPAN







Çiroka Bav û Dayika Gelê Kurd,  
Ewên Heri Kevn, Kurdo û Werdê

Hezar salên bîhuri de  
Ne kê m dibêm, ne ji zêde

Lı ser erdê Rojhilatê  
Tunebû Mihamed, Xetê

Xwedê afirand keç û kurek  
Herdu bedew, herdu jirek

Navê lawık dani Kurdo  
Eve ew bû bavê Medo

Keçıkê ra gote "Werdê"  
Pırr bedew bû lı ser erdê

Zû derbaz bûn mehe û sal  
Bav û dayik ew ji bûn kal

Kurdo, Werdê mezın dıbûn  
Xwarına wan Şir, Nan û Rûn

Rojek herdu derketın der  
Meşıyan bın roja sor, zer

Lı navbera du çeman da  
Ser erdeki şın, çıman da

Kurdo, Werdê rasthev hatın  
Hev fıkrın, "tu kiy?" gotın

Pırsa yekem ê Kurdo bû  
Zımanê wan bı Kurdi bû

Lı hevûdu mêzekırın  
Dûra hevra qısekırın

Bı dılda bûn bengiyên hev  
Nedıxwastın bê êvar, şev

Nêzik hev bûn, bı lez û rev  
Hev maçkırın bı lêv û dev

Gotın " em hev bışêwırın  
Bıryar bıgrın, bizewıcın "

Pıstra dageriyan çûn mal  
Nûçe bıhist dayikên kal

Navda rabırt tıstek zeman  
bı mabest û soz û raman

Çendek dûra bû xwazgini  
Kesek nema qet poxzini

Werdê canık, Kurdo egıt  
Dermal danin, herkes hev dit

Def û Zurne hatın ba hev  
Bı dilani heft roj û şev

Dûra Werdê sıwar kırın  
Jı Kurdo ra gırtın bıryn

Diya Werdê dani şini  
Kurdo rabû çû ser xêni

Kır destê xwe şêvek reng sor  
Avıt kumê pembe û mor

Werdê hat jêr lı ser hespê  
Hêram lı ser sêri, gepê

Lingên Werdê ser zenguyê  
Herkes ketın bêdengiyê

Kevçiyek ser lingên Werdê  
Hat şıkandın, kete erdê

Werdê ling zenguyê derxıst  
Dawetvanan çepik hevıxıst

Berbûk ket bın mıle Werdê  
Ketın hındır, çûn paş perdê

Zava, Şoşpan, refên xortan  
Lı ser erdê Cızra Botan

Xortan Kurdo tandan hındır  
Deri dadan, lı wê bûn sır

Berbûkê dest kırım serhev  
Piroz kır çû, êdi bû şev

Du can lı hev hatın badan  
Ser nivinê hevra paldan

Şev tari bû, der û hındır  
Şoşpan pırs kır " tu Rovi, Gur ?"

Kurdo deng kır gote "bıra  
Karê Rovi çı lı vıra ?"

Lı wê ew bûn jin, mêrên hev  
Şıbe zû hat, derbaz bû şev

Sal û mehe hatın û çûn  
Lı wan gelek keç û kur bûn

Ewın bav û dayka Kurdan  
Nişana canık û merdan

Roj hat mırın bûn dılovan  
Hiştın nav û rûmet û şan

\*\*\*

Newiyên Kurdo û Werdê  
Herzêde bûn lı ser erdê

Roj hat ew ji hev cûda bûn  
Rojhılâtê de belav bûn

Ew bûn xudan navên cûda  
Lı wan derket deng û şeda

Her yek ciyek xwera kır war  
Xwedi kırın pez û dewar

Ew bûn ezbet, ew bûn eşir  
Bûn hukumdar, axa û mir

Eve ewbûn Elam, Kasit  
Şêr-pîling bûn, xurt û egit

Kaldahar û Med û Kardûk  
Wana çêkır Bendav û sûk

Nanen, Lûlû, Gûti û Mar  
Wan kon danin ser avên sar

Sazkırın dezgeh û Dewlet  
Bûn dewlemend, xudan serwet

Cot ajotın, erd şın kırın  
Çand û Zıman, pêşwa bırın

Cara yekem wan cot ajot  
Dayin, gırtın, kırın, fırot

Ev tıst wan nûvedan kırın  
Lı Cihan' ê belav kırın

Dûra Dırav, Pûl çêkırın  
Heywanên hov kedi kırın

Hemû şervan, Sêr û Baz bûn  
Bı destên wan pırr tıst saz bûn

Ew bûn xudan war û Dewlet  
Xudan hêz û şan û rûmet

Wan belav kîr mîrovati  
Kar û xebat, jîr, jêhati

Şareza î lî wan derket  
Jiyan nûjen bû lî serket

Ew bûn Neynîk a jîyanê  
Şarwerî dan vê Cihanê

Rojek derket Şumer, Hitit  
Mîsîr, Akad, Yewnan, Îskît

Bî êriş çûn ser Lûlû, Mar  
Zar, zêç kuştin, wek gurên har

Çar aliyên Şêr û bazan  
Girtin guran, girtin dîzan

Lê çî bîkî çerxa Cihan  
Dîzîvîre, lî her cîyan

Roj hat yê jor, daketî jêr  
Şêr bûn bîndest, Rovî bûn mêr

Şêr û Pîlîng, ew bûn berdest  
Pîrr hejar bûn ketî bîndest

Lê disa jî wenda nebûn  
Xwe parastîn eve sabûn

Ne Sumer ma, ne jî Hitit  
Ne Akad ma, ne jî Îskît

Ew wanda bûn, çûn qet neman  
Hat guhartin, heyam-Zeman

Iro hene Kurmanc, Soran  
Tev Zaza û li tev Loran

Xwedê şikrê lê Kurd hene  
Bist milyon ser erdên xwe ne

Rojek bê disa Azad bîn  
Xudan dezgeh û Dewlet bîn.





" Pêxamberê Kurd ZERDEŞT "



" Pêxamberê Kurd ZERDEŞT "

**Peyxamberê Kurd Zerdeşt û  
Ola Zerdeşt - 600 Sal B.Z.**

Kurdek derket afirand Ol  
Bû xudan nav, bû xudan dol

Bawer ani roja zeri  
Ramanên xwe bîrîn seri

Du tîstên qenc da pêş çavan  
Temaşê kîr keç û lawan

Yek tari bû, yek ji rohani  
Ev zagona wî baş dani

Ronahi kîr pey tariyê  
Serkevîtin da hevkarîyê

Serbxwe qet tîstek nedit  
Xwedê, Şeytan, kesên ifrit

Hevcûda kîr qenci, bedi  
Ar û namûs, şerm û fedi

Her hebûnek dit du ali  
Zarokti û pîr û kali

Bûyin, jîyan, yek ji mîrîn  
Tehl û tîrş û tûj û şîrîn

Wî dit dubendiya jîyan  
Mîrov, heywan, Dar û giyan

Dit cıwanti, wi dit kali  
Dawiyê de ax û xali

Dıbin, hemû dıkevin erd  
Jı xwaşan ra ew dıbin derd

Tina agir, tesira av  
Hemû jiyan ani ber çav

Dûra rûnıst lı ser kursi  
Got "dıvê gel bıbıhisi

Zor pêwıste bıwınsınım  
Cihanê pê bıhesınım"

Bı hezaran heywan ani  
Serjêkır çerm, cûda dani

Lı ser danzdeh hezar çerman  
Nıwısand beyan kır raman

Berê İsa, berê Saman  
Bo gelê xwe kire ferman

Wi got "Rojê bawer bine  
Ew tunebe, jiyan nine"

Pırtûka wi Zend AVESTE  
Ew bû pıspor, ew bû hoste

Dani gelek zagonên bas  
Temaşe kır rê, dırbên xwas

Lı bedena mirovan de  
Çıqas organ hene têde

Jı bo her organek pir 'ek  
Afirand, da, ser muhurek

Dani guneh, dani xêr-bêr  
Gelê Kurd ra bû pêxamber

Navê wi ê xwaşık ZERDEŞT  
Kom nedıkır, wi bac û geşt

Ew pıspora kurê Kurd bû  
Yezidi XAN ı dũ wi çũ

Pirtũka wi Mısafa REŞ  
Kurd pê şabũn, Kurd bũn dılges

Wi ji gelek tıst nũjen kır  
Qenci, bedi temase kır

Şeytan ra got "ew MELEKE  
Dıvê mirov bawer bıke

Lewra Xwedê ew afirand  
Jı gũlan ra rêkır û sand

Wi usa got, bawer ani  
Ev ferman nav gelda dani

Kıra sembol Tawũs MELEK  
Bawer ani Xwedê, Felek

Ew ji mîr çû rama Xwedê  
Newiyê Kurdo û Werdê

Herdu Kurdên xudan rûmet  
Xwedê li wan bike ramet.



Ew ji mîr çû rama Xwedê  
Newiyê Kurdo û Werdê

Herdu Kurdên xudan rûmet  
Xwedê li wan bike ramet.



## **Kurê Kurd Rustem ' ê Zal**

Xweş domdîkîr ew rewş û hal  
Hat Cihanê Rustem' e ZAL

Ew mêrxwasê Şêr, Pelewan  
Navê wi ket hemû Cihan

Mîl û baskên wi' ên bî hêz  
Çiya, Zinar, dîkîr hambêz

Xwedê Rustem bî taybetî  
Çêkîrbû zor heybetî

Bejna wi a wek Sîpîndar  
Dirêj, bîlînd, bedew, kûbar


Pelewan bû hîm jî xwaşmêr  
Dîket şeran wek Pîlîng, Şêr

Roj hat ew jî bû dîlovan  
Ma Cihanê ew nav û şan.





Ahmedê Xani û Mem û Zin



Ahmedê Xani û Mem û Zin

## Çiroka Memê Alan

L1 Mıxurbê welidi Mem  
Dê, bav şabûn, qet nema xem

Bavê Memê Axa, Mir bû  
Xudan hebûn, ax û mal bû

Çıl roj û şev şahî, dilan  
Dılsa bûbûn eş' ra Alan

Mir belav kır, pırr xêr û bêr  
Mem Çeleng bû kureki Şêr

Roj bı roj, Mem mezin dıbû  
Bı aqıl û bı hêz dıbû

Pıştı heft şalina xwe de  
Nav Nivînê, oda xwe de

Veleziya kete xewê  
L1 nêzıka nivê şevê

Memê xewna de Zin dit  
Dılbengi bû xortê egit

Zin keçıka mirê Botan  
Pırr dıkışand bala xortan

Mêrê Meta şıtiya Zin  
Mıroveki hesûd û din

Wi ji dıl derda bû Zinê  
Şık nedıbir Mir û jinê

Dışewtiya dilê Memê  
Xwedê wi ra nehat ramê

Mem sıwar bû çû Botanê  
Ku bıbine wê Şultanê

Lı rê de Qere Tajdin dit  
Hevnasiyan xortên egit

Jı hevra bûn bıra, heval  
Nûçe bıhişt Zina delal

Fızûl Beko pê hesiya  
Bervı mala Mir meşiya

Got "Mirê mın keçıka te  
Da bın lıngan şerefa te

Rabe bıçe tu mêzeke  
Ki ba wêye, tu wi naske

Mem û Zin hatıbûn ba hev  
Hevşadıbûn bı lêv û dev

Kete odê bavê Zinê  
Çav gerand Lehêv, Nivinê

Wina Mem girt Bir'ê de kuşt  
Zina bedew dılkeser hişt

Zine ditax nekır lı wir  
Pışti Memê ew ji zû mır

Beko asteng, ket navinê  
Bû dijminê wê evinê

Nehist ku ew herdu bengi  
Lı hev şabın bı wi rengi

Pırr berxwe ket Qere Tajdin  
Fızûl Beko ew kîre din

Rabû lı şûn, Şûr girêda  
Fızûl Beko dit lı rê da

Şûr kışand, serê wi jêkir  
Ruhê Mem û Zinê şakır

Zina bedew, Memê ALAN  
Bûn Destana hezar salan.

## Ferhat û Şirin

L1 navbera Dicle, Fırat  
Welidîn Şirin û Ferhat

Ew ji bûn dîlbengiyên hev  
Nediketn xew roj û şev

Ehrimanan nehiştin ew  
B1 hev şabîn, bigihijn hev


Evina wan kete Dirok  
Ew bûn Stran, ew bûn Çirok

Ketn zara xort û kalan  
Mina Zin û Memê ALAN

Ew ji keç û kurê Kurd bûn  
Hev şanebûn bêt mîraz cûn.



Kawa ê Hesinkar



Kawa ê Hesınkar



**Derketına Hukma Asûr, Tevgera  
Kawa ê Hesinkar û Gele Ari**

Nışkva derket hukma Asûr  
Tirek avıt, birin kır kûr

Qıral Dehaq, ewê xwinmij  
Rojhılat kır dûman û mij

Kurdeki qebila Kussi  
Tev kurmam'ê xwe ê Persi

Kurd, Pers'an zılm dıkışandın  
Dehaq ew pırr diêsandın

Kurd, Pers ketın tekoşinê  
Ku, bıgırın pêşiya xwinê

Mêrxwasê Kurd nav KAWA bû  
Şûr cêdikır, hesinkar bû

Bo kuştın û zılma Dehaq  
Dıgot "ev gel, nine liyaq"

Şeş kurên wi seri jêbûn  
Jı Dehaq' ra ew qurban bûn

KAWA got "ev zılma bese  
Bıgırın Şûr, Mertal, Dase

Zılm û zorên ber çav, rasti  
Kêr goşt birri, gihışt heşti

Dij derkevın em wek Şêran  
Bımırın lo mina mêran"

Seri hılda apê KAWA  
Jı gel ra zılm nedit rewa

Kalê mêrxwas û hesınkar  
Gelê ARI xwera kır yar

Eriş dan ser kela Dehaq  
Şûr, Mertalan kır reqe-req

Kele hemû şewıtandın  
Serê Dehaq pelçıqandın

Rûnıştın hev şewıriyan  
Bıryar gırtın ser her riyan

Gotın "em Dewletek sazkın  
Çı pêwiste, wê daxwazkın"

Tacê Zêrin dan Fêrûdûn  
Ew bû Qıral, rûnışt lı şûn

Wê sazkın Dewleta MED  
Mala Kurd bû ew sedi-sed

Ew Dewlet bû İmparator  
Çêkır Bendav, Kele û Sûr

Bû xudanê Rojhılatê  
Şan û şeref, tev rûmetê.

**Derketina Qirlê Yewnan  
Iskender'ê Mezin  
- 600 Sal B.Z.**

Iskender'ê Makedonya  
Wi dixwast Mezopotomya

Leşkerên wi gelek xurt bûn  
Kal tunebûn, hemû xort bûn

Rojek derket, hat Iskender  
Xurand, şêland, welat her der

Gelek erd lı dest MED' an çû  
Dewleta Kurd pırr qels bû zû

Hêzên Medya herçûn jar bûn  
Pers bûn bêbext, bı êriş çûn

Tevda şewıandın welat  
Medya nema lı Rojhılat

Kardûk ketın serê çıyan  
Wan şer domand, lı her çıyan

Lê çıbıkın, sed mıxabın  
Dıjın pırr û bet hejmar bûn

Qet kêr nedit rımên Kardûk  
Dıjın xurand Bendav û Cok

Hemû erdê Kurd-Kurdıstan  
Dıjınan kır gor, gorıstan

Kardûk, Zaza, Kurmanc û Lor  
Pirr rîjandin xwina reng sor

Pers û Yewnan, Ereb û Rom  
Şewitandin gund, mezre, gom

Nehîştin Kurd seri rakîn  
Azad bîbîn, dîlan şakîn

Wan deman de Mirên Kurdan  
Dîjmînan ra hiştin meydan

Bona bostek erdê Xwedê  
Hevdîkuştin kurên Werdê

Eşirên Kurd bûn dijên hev  
Şêr dîkîrîn, bî roj û şev

Rojhîlatê Moxol' ên ÇIN  
Lî Rojavê, Neron 'ê Dîn

Tev Samiyan, Gurc û Rûs' an  
Eriş dîdan ser Kurdîstan

Wan nehîştin Kurd ji Dewlet  
Çêkîn, bîbîn hêz û rûmet

Dîjmîn ne yek, ne ji çar bûn  
Kurd ji hevra dost-yar nebûn

Ew heyam ji werge hat, çû  
Tevgera Kurd pêşva neçû.



Zılma Ol' a Islam



Zılma Ol' a İslam

**Derketına Ol'a İslam,  
Rewşa Gele Kurd û Pejîrandına  
Ol' a İslam - P.Z. 612**

Rojek derket Memê Ereb  
B1 dek û dolav û derew

Got "ezım Balyozê Xwedê  
Çı ZERDEŞT 'e, çiye Werdê?

Ez Cihanê, Axıretê  
L1 cenemê, l1 Cenetê

Pırsiyarê qûlan ezım  
Reb ferman kır, ez Balyoz'ım

Eve wera soz û raman  
Bawer bînın mın û QURAN"

Ebûbekir, Omar, Osman  
Tev Memê bun, wan dan ferman

Gotın "hemû Ol'ên Cihan  
Dıvê birbın l1 her ciyan"

Pêkanin Artêşên Barbar  
Eris kırın wek gurên har

Ketın Dest û Daristan'an  
L1 Bajar û Şaristat'an

Tev Şûr, Xeçer, Bıvır û Merr  
B1 bêbexti dıkırın şer

Dıxurandın Xani û Mal  
Nedıgotın "Jın, Zarok, Kal"

Seri hemû jêdıkırın  
Çı dıdıtın, ew dıbırın

Wana dıkuşt, Dewar û Pez  
Dışewtandın Bostan û Rez

Dıgotın "Bêj eşedenna  
Lê ku tu bibêji na-na

Em yekser serê te jêkın  
Bedena te du perçe kın"

Kurdên hejar û belengaz  
Qirina wan dıbû Awaz

Nedıxwastın bıbın İslam  
Lı Mihamed binın İman

Pışti nepejırandınê  
Ser jêdıbûn, rengê xwinê

Axa Kurdıstan sor dıkır  
Ereb, bêbexti zor dıkır

Zımanên Kurd kaş dıkırın  
B1 meqesan jêdıkırın



Dûra didan ber Şûr, Kêran  
Tev Zarok û Jin û Mêran

Gelê Kurd wan usa kustin  
Mal, Milk, talan kırım mıştın

Bı zorê Kurd kırım İSLAM  
Gotın " mera bıbın xulam"

Ol'a İslam usa derket  
Bı zora Şûr, ev OL serket

Bıra ê Kurd eva raste  
Lı ser Dirok tu raweste

Ez bawerım tu bıbini  
Dılê te da xem nemini

Jı bo xwina sedhezera  
Tu bas naskê wan neyaran

Çiye İsla, çiye QURAN  
Bin ber çavan Meqes, Şûr' an.

Dewleta Hesnewi û Şadadi  
- P.Z. 941-951

Xanedanê Kurd Hesnewi  
Lı Cibel' ê bingeh dani

Lı wê saz kır wi Dewletek  
Pırr bıraqıl bû, hım ji jirek

Hukma xwe lı wê ılan kır  
Drav derxıst, kar peşve bır

Pêkani artesek gewre  
Tıxubên xwe wi kır fehre

Roj hat Farıs êriş da ser  
Dewlet xurand, şêland her der

Ew Dewlet ji holê rabû  
Dılê neyar gelek sabû

\* \* \*

Derket Mihamed Şadadi  
Lı doza Kurd ew bû xwedi

Rewandûzê wi him dani  
Dewlet çêkır, hêz pêk ani

Tıxubên xwe berfehre kır  
Paşnavê xwe lı Dewlet kır

Tırk û Farıs pırr bêt kêf bûn  
Wek gurên har lı şûn rabûn

Wan êriş dan, ser êrişan  
Kurd tenê bûn, man pêrişan

Ew Dewlet ji hat xurandîn  
Lê doza Kurd nat temirandîn

Disa Kurd ketin bin destan  
Mêtigeh kîrîn Kurdistan.

\*\*\*

Mirên Erdelan, Bedinan  
Yên Hekari, Botan Baban

Wana ji Dewlet çêkîrîn  
Qesr û Kele avakîrîn

Huner, Wêje gelek pêşket  
Dayikek Kurd li wê derket

Ew canîka Nestûra bû  
Zana, pîşpor, helbestvan bû

Ew him jin bû, ew him ji mêr  
Pênuş hêja, xudan xêr, ber

Lê ew dem ji pîrr neajot  
Roj hat dîlên Kurdan bû sot

Ew Dewlet ji holê rabûn  
Tirk û Faris zor dîlşa bûn.

**Dewleta Kurd a  
Merwani - P.Z. 984**

L1 qurne a Neh û dehan  
Amed, Bitlîs, Tatvan, Silvan

L1 wê saz bû hukma Merwan  
Kurdên Gernas, Şêr û şervan

Qıralê Kurd bû Bad DOSTIK  
Dijmın dıxıst Tir û Xıstık

Kurdan çêkır Rê û Pire  
Qesr û Bendav, malên fehre

Awûz û Çand qenc pêşva çû  
Zımanê Kurd dewlemend bû

Lê Yewnan û Erebb, Iran  
Tev Sûr, Mertal, Xençer, kêran

B1 hoviti êris kırın  
Dewleta Kurd dagırkırın

Werge hat xurandın Dewlet  
Roja çûyi şuva nehat.

**Derketina Tırkan - P.Z. 1071**

Nışkva derket Tırk'ên bêbext  
Lı dest wan de Şûr, Mertal, Zext

Mina gurên bırçı û har  
Eris dan ser gelên hejar

Ew ji ketın Rojhilatê  
Tev QURAN û sılawetê

Cengizxan' ê Moxolê Çin  
Xwin vedıxwar, ew bûbû din

Tırk û Moxol, herdu bıra  
Temırandın şewq û çıra

Şewıtandın hebûna me  
Nehıştın qet Diroka me

Kete Mûş' ê qıralê Tırk  
Har û hov bû tunebû sık

Navê qıral Alparslan bû  
Mıroveki har, xwinmıj bû

Wi got "Tırk, Kurd İslam bıra  
Karê kafır nine vıra


Em dıxwazın arikari  
Bıkın, birbın rojên tari"

Gelê Kurd ew soz bawer kîr  
Kete nav Tîrk, lî wê şer kîr

Ew şer, sêrê Malazgirt' ê  
Bizans nema Mûş' ê, Sêrt' ê

Tîrk derbaz bûn, çûn Qonya' yê  
Selçûk çêbû lî dinya' yê

Çendek dûra qels bû Selçûk  
Hat xurandîn nema War, Sûk.



Selahaddini Eyûbi

Gelê Kurd ew soz bawer kîr  
Kete nav Tîrk, lî wê şer kîr

Ew şer, şêrê Malazgirt'ê  
Bizans nema Mûş'ê, Sêrt'ê

Tîrk derbaz bûn, çûn Qonya' yê  
Selçûk çêbû lî dinya' yê

Çendek dûra qels bû Selçûk  
Hat xurandîn nema War, Sûk.



Selahaddini Eyûbi

Dewleta Eyûbi - P.Z. 1174

Sal hat ghişt qurna donzdeh  
Xaçan teng kır war û bergeh

Lı derdora Kerkûk, Mısûl  
Bı nıftê va, ew erda şıl

Lı wê Mir Nûreddin Mamûd  
Zaf xêrxwaz bû, nebû şerûd

Wi Dewletek lı wê saz kır  
Heq, Zagonên gel mêzekır

Navê Dewlet dani Zengi  
Jı bo İslam bûbû bengi

Wê qurnê de, Xaçparêzan  
Tev barbaran, tev nezanan

Eriş dıdan ser İslam' an  
Nedıdan keseki eman

Bı Şûr, Mertal, Kêr û Xençer  
İslam dıkuştın lı her der

Du Ol bûbûn dıjminên hev  
Şer dıkırın, bı roj û şev



Fransız û İngiliz' an  
Rojhîlat dîkîrîn xîzan

Dîxwastîn ku biçîn Qudsê  
Bajar bigîrîn, leşker vêsê

Padişah ê Kurd Nûreddin  
Bo wan şeran ew dibû din

Bûbû bengiyê Mihamed  
Dîgot "ewe bedew, semend"

Wina arteşek Kurd kom kîr  
Lî cîh rabû sert ferînan kîr

Got "dîvê em xaçparêzan  
Nekîn Qutsê, rêzkîn hêzan"

Pîsmam'ê xwe wî kîr Serdar  
Got "Îslam ra tu bibe yar "

Pîsmam' ê wî rabû ser xwe  
Riya Qudsê zû da ber xwe

Eşîra wan nav Rewandî  
Pîsmam jîr bû, Şêr, efendî

Bî mêwxwasi rabû rêket  
Deh hezaran leşker pêket

Ew ket hember xaçparêzan  
B1 sev û roj kes ranezan

Şer k1r hember Fillip, Riçhart  
Şer zana bû, ew l1 serket

Eve ew bû Selahaddin  
Welat firot, bo Ol û din

Bû Padisah, Împarator  
Navê Islam wi rak1r jor

Wi tixubên Dewleta xwe  
Fehre k1r tev dorberên xwe

Filistin û Mısır, Hicaz  
Yemen, Sûrye, k1re daxwaz

Ew erd ket1n b1n destên wi  
Lê m1xab1n, Kurd man sêwi

Neani navê Kurd zıman  
Vala i çû, ew xwin, zeman

Wi hebûna Kurd-Kurdıstanı  
Da Mısır û Erebistan.

**Derketina Dewlata Osmanli**  
- P.Z. 1300

Lı Bûrsa' ê derket Osman  
Wi Yewnan xıst, neda eman

Nûva çêkır wi Dewletek  
Çerxa Tırk 'an rakır Felek

wi navê xwe lı Dewlet kır  
Dılên har û hovan sakır

Navê Tırk'an bû Osmanli  
Ew kedxwarên sessed sali

Roj hat dema Sultan Yawûz  
Bar gıran bû, gel bû pıst xûz

Yawûz, Sêx İslam rûnıştın  
Ki dij wan bû, hemû kuştın

Barbar ketın Çaldıran' ê  
Xwin rıjandın, wek baranê

Sêşt hezar kes bûn cangori  
Nahlel Yawûz sed hezari

Textê Zêrin nebû qail  
Wi girt jina Şah İsmail

Wan salan de Kurd-Kurdıstan  
Neketibû bın ling, destan

Her eşirek lı nav xwe de  
Wek Dewlet bûn, ciyên xwe de

Destelatek xurt Navendi  
Ew tunebû, Mir, Efendi

Hember dijmin dedibûn yek  
Ew destelat nedihat pêk

Xwe bı xwera dibûn Şêr, Dik  
Hember dijmin dina Pîsik

Yawûz rûnîşt lı ba miran  
Tev İdrîş û Caş namerdan

Qers û Şirin, peyman çêbû  
Erdê Kurdan du perçe bû

Dozfiroşan, welat firot  
Gel bîndeşt bû, ma tazi, rût.

## Çend Wejevanên Diroki

Ali Heriri, Feqi ê Teyran  
Bo evinê, ji bo yaran

Nivîsandin wan hişên xwe  
Bo me hiştin diwanên xwe

Pey wan Mele, Ahmed XANI  
Ahmed ruhki teze ani

Mijûl bû ser pîrsa Netew  
Berxwe dîket, nedîket xew

Dîgot "çira li nav meda  
Hevgirtinek tune cih da

Dîvê em ji serfiraz bin  
Rabin serxwe, Şareza bin

Heke ku em bîbîne yek  
Çêkî Dewlet, bîbîn hêzek

Bêt guman wê Ereb û Tirk  
Mera bîbîn xulam bêt şik

Lê ez çib'kîm iro ev rews  
Mir ketine ser rivek şaş

Bo neyaran ew kar dîkîn  
Erdê evrar par-par dîkîn

Tev dijminan gel dıkojin  
Şeran de xortan dıkujin

Lê nızanım ew rews çibe?  
Hêvi dıkın gel xew rabe

Bıbıne dost û yarên xwe  
Zû sazbike Dewleta xwe

Lê mın nedit, Kurd bıbının  
Wê rojê, bındest neminın"

Belê, Xani usa dıgot  
Wê hêviye dılê wi sot.

## Şerê Kela Dımdım

Çû ser dımdım, Şahê Iran  
Tev artesek herê giran

Ket çeperê kela Dımdım  
Dest Kurdan de Şûr, Mertal, Rim

Bı mêrani hember dijmin  
Ketın nav şer keç, mêr û jin

Ew Xano'ê Şêr Cengzêrin  
Bı mêrxwasi dıkır qirin

Dıgot " heta em yek hebın  
Qet radeste dijmin nabın"

Şah Abas'ê bêbext û har  
Ser hespê de nedihat xar

Ferman da Pasdar, barbaran  
Kele dan ber gulebaran

Kurdan nexwast radest bıbın  
Dil bên girtın, xulam bıbın

Rûnıştın hevra sond xwarın  
Jehr kırın av, av vexwarın

Hemû lı wê bûn cangori  
Kurdperweran kırın lori.

**Serihıldana Şêx Ubedullah**  
**- P.Z. 1800**

Ubedullah û Yezdan Şêr  
Hım zana bûn, ew hım ji mêr

Şêxê dılsoz, kalê mêrxwas  
Ew zana bû, bê tırs, Gernas

Lı hemberê Tırk û Farıs  
Berxwe dıda bê tırof û tırs

Osmanlı artesek gewre  
Amade kır, şer kır fehre

Farıs ji ket hindirê şer  
Hevra şewıtandın herder

Sed xıhabın Şêx girtın dil  
Çeqel, Rovi li wê bûn Fil

Romê Şêx şand Ştenbolê  
Ew Tevger rakır h holê

Şêx reviya ew şuva hat  
Derbaz bû li Diclê, Fırat

Hestê hezar leşker komkır  
Disa wi destpêka şer kır

Lê şed heyfe ew sermeket  
Romê Şêx girt, hêz li bınket

Dûra dijmin Şêx şand Mekkê  
Lı wê mır, tu wî binekê.



## Şerê Cihan a Yekemin - 1914

Nışkva derket şerê Cihan  
Xwin heriki lı her ciyan

Çar aliyên Romê de şer  
Bed dom dıkr jiyanek jehr

Lı Rojavê, lı Rojhilat  
Romê nedit riyek felat

Roma Reş pırr jar ketıbû  
Her ciyan de, binketıbû

Hukma Şeytan û hilebaz  
Kete dıqe hêzek xêrxwaz

Kurda ra got "em bırane  
Werin hember kafırane

Em şer bıkın ji bo welat  
Ku, hûn û em bıbın felat"

Lı şer wê xwaşteka Romê  
Dilê Kurdan hate ramê

Şerokên Kurd hev sêwırin  
Lı tev peyvên Tehl û Şirin

Abdulqadir 'ê GEYLANÎ  
Pêşneyarek ne baş ani

Got 'rewşa Romê ne başe  
Bervî têkçûnê dimeşe

Divê em ji mîl Romê dîn  
Em dîlşozîn, ne namerdîn

Pîştî şer Rom wê heqê me  
Bîde hemû daxwazên me

Heke ku Rom usa neke  
Wêcar xali serê xwe ke

Em bî hêza Mîl, Baskên xwe  
Bî zor bîstinî heqên xwe "

Mirên Kurdan mîl dan Romê  
Leşker şandî Yemen, Şamê

Lî Yemen' ê, lî Rojavê  
Meyitên Kurd man bîn tavê

Sed hezaran Kurd cangori  
Bûn, dayikan kîrî lori

Sîrp û Romen, Bulxarîstan  
Lî Rojhîlat Erebiştan

Bîn destan de ew Rîzgar bûn  
Îlan kîrî wan Serxwebûn

Romê derxîst Destûr, Ferman  
Bo kustîna gelê Ermen

Du miliyon Ermen kustîn  
Kevîr ser kevîr nehistîn

Ewqas ji Kurd cangori bûn  
Lî seran de bo Romê çûn

Lê disa ji Kurd-Kurdîstan  
Rîzgar nebû lî bîn destan

Werqas xwin, bî vala î çû  
Pîrr malan da derneket dû

Romê mala Kurd sewitand  
Bo mafên xwe ew xwin rijand

Lê disa ji Rom serneket  
Şer wenda kîr, ew lî bînekî

Padîsah text û tacê xwe  
Cihîst, felat kîr canê xwe

Lî dawîya serê Cihan  
Ne Sultan ma, ne Qîral, Xan

Hukma Romê lî holê de  
wek kevîrek lî golê de

Wenda bû çû, Sultan nema  
Hat quhartî, nû bû sema.

**Derketına Mistefa Kemal  
- P.Z. 1919**

Lı ser fermana Vatetin  
Serbazeki har, derewçin

Derket ew lı Stenbolı 'ê  
Çû Samsûn'ê, Anadol'ê

Erzurum' ê civin çêkır  
Nûçe Sêvaz'ê ra rêkır

Lı wê rabû çû Sêvaz'ê  
Ku, lı wê ji bigre sozê

Eve ew bû, paşa Kemal  
Ji xwera dit gelek heval

Wi gazi Şêx, Mirên Kurd kır  
Arikar xwast, peyman çêkır

Wi ji got "em Islam bira  
Karê kafır tune vıra

Ji bo Eli, bo Mihamed  
Hûn Ari'ne, newiyên MED

Werın bıdın me hûn destan  
Dûra sazın Kurd-Kurdıstan"

Usa xapand wi Axa, Mir  
B1 aql bû, b1 rasti jir

Dûra rabû çû Anqarê  
Gel ser dîkir l1 her derê

Mir, Begên Kurd leşker şandin  
B1 nezani gel xapandin

Ew mêrxwas û xotên egit  
Hukma Romê xwina wan mit

Kurd ketin şereki gıran  
Tev pısmam û l1 tev bıran

Eriş kırım weka şêran  
Zû serketın mina mêran

Artesên Yewnan bınketın  
Ew revıyan, Kurd dûketın

Heya İzmir fıltandın  
L1 Behrê de xenıqandın

Rızgar kırım erdê Romê  
Rom l1 Kurdan nehat ramê.

## Peymana Sewr - P.Z. 1920

Lı Fransa kom bû Cihan  
Bona pırsa Kurd û Filan

Şerif Pasa, Kurdê dılsoz  
Bo pırsa Kurd, wi stand soz

Ew nûnêrê gelê Kurd bû  
Mıroveki Kurdevin bû

Lı wê çêbû peyman a Sewr  
Din û har bûn, Tırk'ên Gurgewr

Tırk rûnıstın, hev sêwırin  
Wek Çûkreş'an, Tû hêwırin

Gotın"em planek çêkın  
Mirên Kurdan lı dij hevkin

Hınekan bıkın Newêrger  
Bên meclîşê, gelek nefer

Ruh û canê wan em mısdın  
Ew çavbırçi, doxın sıstın

Em bıdın wan, Drav, Jın, Mal  
Ku, çareser bıbe ev hal

Wana usa bıxapının  
Dûra qıra wan em bının

Divê iro em Hırç'ê ra  
Bibên"Xalo"ser pîrê ra"

Ketın nav dek û dolavan  
Navê Xwedê, bı sılavan

Balyoz sandın ba Mir, Axan  
Ba Seyidan, lı ba Şêxan

Gotın"werın em bı hevra  
Çêkın Kurdistan ji wera

Meclisa nû, ê we, ê me  
Em dest hev dın Xwedê rame

Lingên kafır, nekın welat  
Ku, Ol'a me bibe felat

Usa nebe, kafır wê bên  
Ol'ê rakın wek Seg bîrrên

Çendsed sale em ciranın  
Wek pıdı û dev, dıranın

Ol'a me û welat yeke  
Kafır dıxwaze me cêke

Ev ji nabe, bo we û me  
Ku, bêjın na, wera serme"

\*\*\*

L1 Angarê meclis kom bû  
Komara Tırk, lı wê saz bû

Romê xapand, heftê du kes  
Ani meclisê bı hewes

Werge Kurd ketın meclisê  
Mirên Mêrdin, Mûs, Bitlis'ê

Heftê du Kurdên Newêrger  
Doz fıros bûn, bêd Dıl, Ciger

Diyap axa, Hesên Xêyri  
Dıvê kes bo wan negiri

Ew Newêrgerên Dêrsım bûn  
Bêd dengê gel, bı xwe çûbûn

Rojek Mıstefa Kemal got  
"Werin meclisê seri qot

Bı bêdengi, li şûn rûnın  
Newêrgerên Kurdan hûnın"

Diyap axa zef şadı bû  
Herkes lı ber wi radı bû

Mıstê kor ew baş nasdı kır  
Destên wi dıgirt maçdı kır



Wira digot "bavo, baba  
Canê min ji tera heba"

Roj hat ew ji kuşt, wendakir  
Hebûna kurd qedexe kir

Eve, ewn, ew Tirk'ên xas  
Leheng, Şareza û mêrxwas

Rovi çiwext ku, bibe Şêr  
Tirk ji ew dem, dibe xwasmêr.



İhsan Nûri



Ihsan Nûri

**Komelên Kurd, Serihıldan  
û Tevkuştina Qoçkiriye - 1920**

Komelên Kurd irşad, Hêvi  
Lı dij wan bûn, Tirk'ên Rovi

Ew komelên gelê Kurd bûn  
Bo wan Kurd serbîlind dîbûn

Karên qenc û bas dîkırın  
Gelê Kurd şiyar dîkırın

Hember wan dek û dolavan  
Kurdperwerên Kurd dîkovan

Dîbûn, ew berxwe dîketın  
Şev û roj ranedîketın

Şêr û dîlsozên Kurdistan  
Gotın"divê em bêt westan

Bikevın nav kar, xebatan  
Bının berçav, her babetan

Ew kesên bêbext, doz firos  
Bo gel nakın xızmetek baş

Bı lez û bez, em asteng bın  
Hin ku zûye, em rê nedın"

Serokên Kurd hatin ba hev  
Hev şewirin bı roj û şev

Dawiyê de girtin bıryar  
Ku, şer bıkın hember neyar

Nûri Dêrsımı, Ali Şêr  
Tev Ali Şan, ew her sê mêr

Ew bûn berpırsiyarên şer  
Tıfing girtin, derketin der

Şerê Qoçkiri destpêkır  
Hukma Romê leşker rêkır

Serdarê Tırk Topal OSMAN  
Lı Mıstê gırubû ferman

Wi sewıtand war û bani  
Xwin herikand weka kani

Negot Zarok, qet negot jin  
Bo xwina Kurd ew bûbû din

Laz Osman, Mıstefa Kemal  
Ne can hiştin, ne dewar, mal

Temırandın ew serhıldan  
Talan Kırın warên merdan

Rıj'ya xwina Çıl hezaran  
Kurd birnekın wan neyaran.

## Peymana Lozanê - 1923

Emperyalên Cihan kombûn  
Kurdên xewok şiyar nebûn

Rûnûştin bajarê LOZAN  
Ketin nav gengeşa sozan

Lî wê peyman nîvîsandin  
Dûra rabûn, bî deng xwendin

Gotin "heftê du Mirên Kurd  
Biryar dane, bîryarek rind

Naxwazm Kurd û Kurdistan  
Xwe nabinin qet bîn destan

Dibên "Kurd û Tirk bîrane  
Eslê me yek, kok Tûrane"

Binhêrîn hûn nameyên wan  
Aha evîn, em qurban, can

Em nîkarin tîstek bîkîn  
Çawa em wan, li hev cêkîn"?

\*\*\*

Belê, ew caşên do fîros  
Derew kîrîn vala û boş

Bo mafên xweên gemarîn  
Gel fîrotîn, jehr kîrîn Jîn

Welatê Kurd bû çar perçe  
Heftê du kes bûn dest pençe

Bûn xulamê hukma Romê  
Wek Pez, Dewar ketin gomê.



Misteta Kemal û Diab Axa





Misteta Kemal û Diab Axa

**Pîrsa Kurd lî Rojev'a  
Meclisa Tîrk da - 1920-1923**

Pîrsa Kurdi bî carek dîn  
Ket Rojev'ê, Mîst bû har, dîn

Meclis kete nav gotbêjan  
Wê babetê da Mîstê jan

Pîr hêrsket Mîstefa Kemal  
Wi got"bîra, bînhêr heval

Ev welat, welatê Tîrke  
Lî wê rûne, kuro şermke

Lewra Kurd, Tîrk yek nîjadîn  
Rûnî ahengeki xwedîn

Welat yeke, perçe nabe  
Ki dibê"na"bîla rabe

Ez jî wera bêjim disa  
Qet naxwazim peyvên usa

Carek dîn ku, bîbîhisim  
Ku nekujim, bêt namûsîm".

Hesen Xêyri rabû serxwe  
Pênûs, Defter dabû berxwe

Got"bîra'nê Paşa raste  
Gelê Kurd, Tîrk wek Dew, Mast'e

Havin û koka me yeke  
Heqê kêye, ew me cêke"?

Kemal Paşa, xwe sûn rakır  
Çû eniya Hesên maçkır

Got"bı rasti tu dılsozi  
Xwedê jı te bıbe razi

Ez dıxwazım, sıbe bıra  
Bı cılên Kurd werê vıra"

Rojtıra dın, Hesên Xêyri  
Xwe xemıland, vekır deri

Bı lez û bez, rabû rêket  
Qet çekûçek, seri neket

Cemedan û Şapık û sal  
Ket meclisê Hesên'ê kal

Roj hat gazi Hesên kırın  
Dest gırêdan, gırtın-bırın

Dadgır'ê"Şerxwebûn"pırs kır  
"Çıra cılên Kurd te xwe kır"?

Got"Paşa'ê mın ferman kır  
Jı bona ev, mın kinc xwe kır"

Gotın"Paşa tu cerıband  
Derewên te, wi hember xwend

Lê ku rasti tu Tirk'bana  
Bersiva te dibû na-na"

Guh nadan gotnên Hesên  
Kırın stu, şirit û ben

Hesên Xêyri kire hawar  
Qet guh nedan Tirk'ên neyar

Got" cangoriyên Kurdistan  
Mınra vekın mıl û destan

Îro ez tēm nav refên we  
Bıborın, ez canê we"

Hesên Xêyri dereng mabû  
Cellat hêrs ket, lı şûn rabû

Bın lıngan de kışand kursi  
Qet hawara wi nepırsi


Benê bı Rûn, gewri şıdand  
Kar û berên hesên qedand

Ew ji lı wê, werge kuştın  
Lı dijên xwe kes nehiştın

Yên ku man ji , ew revıyan  
Ketın bınerd, serê çıyan.



Simko Axa



Simko Axa

Lı qurna bistan de, çend  
Tevgerên Kurdistan'a  
Iran û Iraqê - 1920-1922

Lı pısti şerê Cihanê  
Tevgera Kurd lı Iran'ê

Rabû serxwe hember dijmin  
Rêzkıribun Mêr, Xort û Jin

Serokê eşira Şıvak  
Rızaliyê, heya Şımak

Rêzkır hêzek herê gewre  
Her Tıst ani berçav, fehre

Eve, ew bû Simko ê Şêr  
Tırs nezan bu, Gernas û Mêr

Emperyalên har û kedxwar  
Lı şûn rabûn, wek gurên har

Ew xwinmijên çav birçi, har  
Şandin Iran Olperest MAR

Mar Şemûr, keşişê Asûr  
Hesabê xwe dıkir hûr-hûr

Wi ji dıxwast bibe Dehaq  
Bıgire Kurdistan, Iraq

Rûs, Ingiliz, pîst dîdan wi  
Lı pey wi de, ew dîdûn si

Simko Axa plan hınkır  
Hember plan, plan çêkır

Xwest ku Mar Şemûr bıbine  
KONEŞAR'ê tev wi rûne

Sed û Çıl leşkerên Asûr  
Ketın riek, dijwar û dûr

Simko Axa dorbera wan  
Birriya, kuşt, lı wê sed can

Pîşti wê kuştına Keşiş  
Fılan, Asûr kırın Kîş-kîş

Berê xwe dan KONEŞAR'ê  
Ser xwastek û wê biryarê

Bı hevra wan êriş kırın  
Gund şewtandın, talan kırın

Sed û Çıl hezar Kurd kuştın  
Lı gundan de, can nehiştın

Lı pîsti wê tevkuştinê  
Jı bo qesas, jı bo xwinê

Simko êriş da ser Asûr  
Birin lı wan gelek kır kûr



Hêzên Asûr bûn tar û mar  
Rûs û Îran, ew bûn din, har

Leşkerên Rûs li tev Îran  
Çûn ser Kurdan, mina guran

Lê disa ji serneketin  
Hêz kışandın, şuva hatın

Hukma Faris, plan çêkır  
Balyozek Simko'ra rêkır

B1 derew û dek, dolavan  
Sonda"QURAN"tev sılavan

Gotın"divê em zû rûnın  
Du gel bıran li hev binın"

Simko Axa ew bawer kır  
Qet guhdare, kesi nekır

Rabû rêket, b1 sıwari  
Çû ba dijın, bo wi kari

Faris kır dafikê, ew kuşt  
Tevger werge bêt seri hişt


Simko Axa ê dılovan  
Dıl, kezewên Kurd kır kovan

Ew Şêr, lehengê Netewi  
Kurd birnekın tucaran wi.

-----  
Koneşar : gundeki Kurdistan'e Iran'e



Șex Mamût Berzanci



Şêx Mamût Berzanci

**Serihıldana Şêx Mamût  
Berzanci - 1919**

Lı başûrê, Şêx Berzanci  
Xwast daxwazên gel bine ci

Wi rabû doza welat kır  
Kete nav gel, gel qenc rêzkır

Hukma Iraq'a hov û har  
Jı İngiliz xwast arikar

İngiliz'ên por kej, çav sût  
Bı eriş çûn ser Şêx Mamût

Lı tev top û tank, fırokan  
Nenhêriyan Jın, zarokan


Esman de bombe barandın  
Gund û bajar şewıtandın

Bı hezaran mırov kuştın  
Gelê Kurd bêt havıl hiştın

Biritanya bû dij Kurdan  
Lı semeket ew ser'hıldan.



Şêx Said



Sêx Said

## Serihıldana Şêx Said - 1925

Hezar nehsed bist û sisê  
Wexta giyan, kax û kêşê

Kurdperwer lı ciki kom bun  
Hevdu ditın, pırr dılşa bın

Rûnıştın lı hev şêwırın  
Weka bıran, peyvên şirin

Pışti gelek got û bêjan  
Keşên zana, kesên rêzan

Gotın"em komelek sazkın  
Gel bêt rêze, em gel rêzkın

Bese êdi ev razandın  
Bıbe ku xwin bê rijandın

Çendşed sale zılma Romê  
Hukmek hove, naye ramê

Rom naxwaze Kurd şiyarbın  
Xudan Dewlet, xudan war bın

Ev erd, erdê me Kurdane  
Navê welat Kurdistan'ê"

Lı nav xwe de gırtın bıryar  
Rewşa welêt kırım diyar

L1 wê Rêbaz nivîsandin  
Deq û deq bî hevra xwendin

Sazbû Komela AZADI  
Bi dîlxwazi, bî dîlsadi

Bû serok Xalît'ê Cıbran  
Pirozkırın mina bıran

Komelê riçal da nav gel  
Weka koka Kewli, Nefel

Rêzanan gel rêz dıkrın  
Serxwest û şiyar dıkrın

Romê şık bîr, xew lê revî  
Bû Şeytan'ek, bû wek Rovi

Bî dırav û malê dınê  
Caş kıriyan jî bo xwinê

L1 ser bêbextiya caşan  
Ew tevger ket bın jan, êşan

Eşirên Kurd xwe fırotın  
Xalıt beg jî hate gırtın

\*\*\*

L1 Pali yê eşir kom bûn  
Jî bo Xalıt, zef xemgin bûn



Yûsîf Ziya rabû serxwe  
Pênûs, qaxîz wi da ber xwe

Tîlî rakîr Yûsîf lî wîr  
Temaşê kîr Şêxê nemûr

Got"ez dîbêm ku, Şêx Said  
Bîbe serok kalê egîr"

Hemû kesan, bî dîl û can  
Gotîr"başê, qence raman"

Kalê leheng, ew pêşneyar  
Pejîrand û dest avîr kar

Lî wê rabûn, çûn Pîran'ê  
Te dîgot"dîçîn dîlan'ê".

\*\*\*

Hezar nehşed û bîst û pênc  
Lî Pîlî yê, Hûn'ê û Gênc

Tevgera Kurd zor geş dîbû  
Lî nav gel de, xurt, baş dîbû

Rojekî leşkerên Romê  
Tev Tîfîng û Şîlf û Rîm'ê

Rabûn ew çûn gundê Pîran  
Wek Çeqel û weka guran

Serbazeki dijminê har  
Yeki bêbext, bejn kın, mirdar

Wi Liztukek lı gund çêkır  
Yekser lı wê, ser destpêkır

Çend leşkerên dijmin mırın  
Mayin revyan, nûçe bırın

Ser wê bêbextiya serbaz  
Lı Anqarê, Tokat, Sêvaz

Artesên Tırk wê rêketın  
Çıyan, deştan de daketın

Lı tev top û tev firokan  
Nenhêriyan Jın, zarokan

Hêzên Kurd bêt havıl mabûn  
Bist hezar Kes hevra rabûn

Serokê Kurd kal Sêx Sait  
Mêrê zana, pıspor, egit

Hemû Kurdên Azadixwaz  
Lı cih rabûn, wek Şêr û Baz

Ketın nav şereki gıran  
Lı Xarpıt'ê, Mêrdîn, Piran

Serdarê şer leheng YADO  
Ew newiyê Werdê, Kurdo

Ferman da kalo ê pıspor  
Got"bıgırın Ala kesk, sor

Eriş bıkın weka şêran  
Em bımırın, mina mêran"

Gırtın Ahmed, gırtın Xarpıt  
Rom ji dibû har û ifrit

Wê beri dan Çapaxçûr'ê  
Erzurum, çemê xebûr'ê

Lê eşira Xormek, Lolan  
Dızı ketın kort û çalan

Paşva kuştın bırayên xwe  
Dan dest dijmin, namûsên xwe

Bona Ol û bo meseban  
Bûn hevalê can qeseban

Ew tevger werge şıkandın  
Mızgin ji Romê ra şandın

Dil hat gırtın kal Şêx Sait  
Romê xwina hezaran mit

Sazbû dadigeh"Serxwebûn"  
Tırk'ên Faşist gelhev kom bûn

Çıl û heşt sêpi wan danin  
Şêx Abdulqedir ji anin

Tev Şêx Sait dardakırın  
Meyitên wan girtın, bırın

Abdulqedir'ê Geylani  
Romê ew kuşt dawî ani

Şirit kırın gewriya wan  
Cangori bûn çıl û heşt can

Li ser kursi kalo bang kır  
Bo gelê xwe wi hosi kır

Got"bıra'no, hûn tola me  
Bıstının, şakın ruhên me

Her bîji Kurd û Kurdîstan  
Wê felat be, ew bın destan"

\*\*\*

Wi şeri de dıjminê har  
Kuşt gelê Kurd pênçe hezar

Hin ronakbir reviyân, çûn  
Lı Şam'ê wan saz kır Xoybûn

Pêşengkar mala Bedirxan  
Wan ji wenda kır gelek can

Derxıstın"Ronahi, Hawar"  
Tev Cigerxwin, kesên bîjar

Zıman, Wêje, pêşva bîrîn  
Roj hat ew ji hemû mîrîn

Xwedê rama xwe li wan ke  
Ku, Bihîşt hey, wan wê cih ke.



Ji malbata Bdirxanan de çend Ronakbir




Nûri Dersîmi

Zıman, Wêje, pêşva bîrîn  
Roj hat ew jî hemû mîrîn

Xwedê rama xwe li wan ke  
Ku, Bîhişt hey, wan wê cih ke.



Ji malbata Bdirxanan de çend Ronakbir



Nûri Dersîmi



**Serihıldana çiya ê  
Agırê 1926-1929**

Hezar nehsed bist û nehan  
Hemû Kulilk, Nêrgız, Reyhan

Vebûn ser Çiya'yê Agır  
Pırr bêdeng bûn, Dar û Kevır

Lı wê derket Nûri Sait  
Kurdperwer bû, rewş baş dıdit

Ew serbazê leşkeri bû  
Zana, Pıspor, Azadixwaz bû

Wi pırr dıxwast Kurd Azadbın  
Bıxwinın û Şareza bın

Derket lı Arteşa Romê  
Xwedê wira nehat ramê

Wina Tevger'a Kurd rêzkır  
Kurdistan'ek Azad doz kır

Got''ya mırın, ya Kurdistan  
Kurd neminın lı bın destan''

Şadeye Çiya'yê Agır  
Lı wê derket şereki gır

Bı mêrani Kurdên leheng  
Bo welat dıkırın şer, ceng


Lı hember Top, Tank, fırokan  
Dırbên mezın dıdan Tırk'an

Dûra Iran, fırokên Rûs  
Bûn yarên Tırk, rewş kırın pûs


Sê Dewlet'ên namerd û har  
Gund û bajar kırın tar-mar

Bı hezaran xort û Jın, Mêr  
Dan ber gullan, sılfan û Kêr


Ew Tevger ji werge têk çû  
Nûri Sait ji felat bû.



Seyit Ali Rıza



Nişana Zordestiya Dewlata Tirk



Seyit Ali Rıza



Nişana Zordestiya Dewlata Tirk

**Tevkustîna Dêrsîm**  
**Sala 1937-38**

Sala si û heft û heştan  
Lî ser Çiyan, lî nav Deştan

Çiya, war û deştên Dêrsîm  
Mîna Zilan, mîna Dîmdîm

Der-dor ketûn nav çeperê  
Roma bêbext lî her derê

Wê çêdîkîr dafîkên xwe  
Tev doz firoş, caşîkên xwe

Xebat dîkîr bî roj û şev  
Eşîrên Kurd dîkîr dij hev

Mîstê kor û Celal Bayar  
Bona Dêrsîm dabûn bîryar

Serok-komar bû Mîstê kor  
Serok-wezîr Celal Bayar

Wan dîgot"lî vê Cihanê  
Jî bo Dîn û bo îmanê

Qetla Kurdan zor helale  
Ki bîkuje, ew delale

Dîvê Kurd lî holê rabîn  
Ku ranebîn, Tîrk şanabîn

Mebên Zarok, mebên Pir, Kal  
Mebên seqet, mebên kerr, lal

Ki kû Kurde, wan bıkujin  
Heya Kal û Pıtık û Jin

Çêle ê Mar bêt jehr nabe  
Seri jêkın, dereng nebe".

Ferman nıvısandın usa  
Yekser dan Avdılah Paşa

General'ê Awerte bû  
Ferman stand, ew rabû zû

Bı tırênê çû Xarpitê  
Leşker komkır Mûşê, Sêrtê.

\*\*\*

Kalê mêrxwas Seyit Rıza  
Pırr dıxwast Kurd bıbin Aza

Rıza gazi Mir, axan kır  
Soz, ramana xwe beyan kır

Wi got "hemû Kurd bırane  
Dılsozi şana mêrane

Ev rewşa me dılê dijmin  
Şadike, hûn guh bıdın mın

Werın em hêzên xwe yekkın  
Yek beden bıın, hevra şerkın



Bo Kurdistan'ek Serbixwe  
Em kar bıkın bo doza xwe

Armanç eve, em qêret kın  
Gel guneye, zû felet kın".

\*\*\*

Mir û axan guhdar nekır  
Dıjmin bihist pırr dılsa kır

Eşir hevra nebûn dost, yar  
Lı ew kêr dit Roma neyar

Xormek, Lolan û Bamasûr  
Ev eşiran dıman lı dûr

Îzol, Aryan, Xeran, Şadi  
Lı dozê ew nebûn xwedi

Bêt ali man mêzekırm  
Caşan çı got Guhdarkırın.

Lı lodekan Husên Doxan  
Bû hevalê Tırk Alpdoxan

Husên dıgot "Mırşûd, Pırım"  
Tev caşık Ali Yıldırım

Jı bo dıjmin kırın xebat  
Lı Mêzgirê, Pêrtég, Xozat

Pırr geriyan nav eşiran  
Tev namerdan, tev bêt şiran

Dıgotın "Mıstefa Kemal  
Ew bıde we, Mılk, War û Mal

Hûn guh medın Seyit Rıza  
Ew dınıke, nine Aza

Çıye lo-lo Kurd-Kurdıstan?  
Êm ketıne qurna bıstan

Tırk û Kurd em yek bırane  
Navê Xwedê, bar grane".

Husên dıgot "pirê weme  
Lı axıret, ez gel weme

Heke hûn guhdar mın nekın  
Nıfır bıkım, dılsa nekın

Bawerkın roja masherê  
Mın bıbının lı wê derê

Ceddê mın Mansûr, Mihamed  
Axıriyên we, bıkın bed

Sonda mın Eli, Mihamed  
Ez nedım we, Şefat, İrsad".

Wi navê pısmamê xwe ji  
Da Romê ku, Rom bıkuji

Xortê delal, Ali Barût  
Ronakbir bû, doz dıajot

Leşker lı dû Ali ketın  
Deşt û kaşan de daketın

Ali ditın lı Sorpiyan  
Kelepçe kırın, dest piyan

Xortê hêja lı wê bû dil  
Bû nêçira dijmin, gafil

Cenderman Ali dan pêş xwe  
Riya Xarîtê dan ber xwe

Bervı çiyay Mercimekê  
Bırın kurê Apê Kekê

Rêva Ali gelek ti bû  
Lêv qelişt, zıman zıwa bû

Gihıştın ser kaniyeki  
Kurdo fêrbe, tu birneki

Ali lı leşker tıka kır  
Got "keremkın tıştek lı vır

Destûr bıdın bo qılmek av ·  
Vexwım ku ez, bavêjım gav"

Cenderman got "fêrmo, vexwe  
Xarbe, zûke, rabe serxwe"

Ali xar bû, lêv da avê  
Lı hûrdem û lı wê gavê

Cenderman tîfing kışandın  
Teqandın, çiya hêjandın

Gulle berdan ser seri wi  
Pîjîqi mêjo, xwina wi

Ava kaniyê bû rengê sor  
Rojê mêzedekır lı jor

Ew nûça reş zû belav bû  
Dıjımın bıhist, pırr dılşa bû

Bavê Ali Apê Kekê  
Elif, Mırcan, tev Çiçegê

Dê, bav, xwişkan lı xwe xıstın  
Por lı serên xwe nehiştın

Danin şini, kırın hawar  
Gotın"kurmê darê, dar xwar"

Bı wi rengi, bı wî tehri  
Bı bêbexti, bı nokeri

Dıjımınan ra ew bûn heval  
Pırr dan kuştın kesên delal.

\*\*\*

Aliya dın de, lı Xarpîtê  
Mêrdin, Amed, Mûşê, Sêrtê

Romê gelê Kurd kom dıkır  
Lı dıji hev baş rêz dıkır

Dıgot"ki ku, deh Elewi  
Bıkuje, Xwedê lı ba wi

Ew danıŝe lı Cenetê  
Gel Mihamed, axiretê".

Tırk'ên faŝist, Kurdên Şafi  
Tev Hambeli, tev Hanefi

Bo kuŝtına Elewiyan  
Lı tev dijmin ketın riyan

Kêr-Şûrên xwe dan ser hesan  
Ku, serjêkın dehe kesan

Riya bıhiŝt xwera vekın  
Ba Mihamed, dilan ŝakın

Tev Horî û tev Melekan  
Rûnın, bıxwın Havyar, hêkan

Ew perwerde dijmin dıda  
Lûl dıkır û lûl aj dıda

Lı Sêvaz'ê, Mûŝ û Wan'ê  
Qers, Heqari, lı Tatvan'ê

Kurd dıhatın, hember Kurdan  
Dıŝewtandın warê merdan

Romê dıgot"bıkuj Kafır  
Ku, Xwedê we bıbine vır"

Kurdên xesim û olperest  
Dîçûn ser bîran, raste-rast

Jî bo Romê bîra dîkuşt  
Ku, rojek zû biçe Bîhist.

\*\*\*

Seyit Rîza û Ali Şêr  
Ew mêrxwas bûn, Gernas û Mêr

Tev Şahan û Beytar Nûri  
Daxwazên wan neçûn seri

Beri şer da, Tîrk'ên Casûs  
Hewa kîrî duman û pûs

Gelek Casên Kurd kîriyan  
Sîr standin, dageriyan

Bîraziyê Seyit Rîza  
Şev û roj ew ranedîza

Navê wi bêbextî Rayber  
Ew dijîmîn ra bûbû rêber

Casûs cern Rayber rûnîştin  
Zêr û Ziv dan, rê derxîştin

Gotin"ku, tu Ali Şêr  
Bîkuj, bîstin, heqîbek Zêr

Seri jêke, mera bine  
Kesek dîji Tırk nemine

Em bîdın te Mal, Dewar, Erd  
Lı Cihanê tu nebini derd".

Rayber çend Caş girtın ba xwe  
Wi xwaş çêkir planên xwe

Tev Zeynel kop ew rêkertın  
Gaz û tatan de daketın

Çûn lı Ali Sêr bûn mivan  
Rûnıstın ser kursi, diwan

Gotın "bıra, em birçine  
Mera tustek xwarın bine"

Zarife zû rabû ser xwe  
Pêşmala xwe, wê da ber xwe

Ani Toraq, Gırar û Nan  
Ser sıfrê de çend nefer can

Nıskva yeki rakır Tıfing  
Teqand lı ser Kezew, Dıl, Sing

Ali Şêr ket ser erda sar  
Zarifê kır qirin, hawar

Wê Şeşar girt, lez çû ser wan  
Wan bêbextan, nedan eman

L1 wê wan ew du can kuştın  
Ser jêkırın, beden hiştın

Wana têt xwar Nan û Şorbe  
Kırın dest xwe, Çal û Torbe

Herdu seri kırın Torbe  
Nêzık bûbû, şev mıxurbe

Tariyê de rabûn ser xwe  
Riya Xarpıt, lez dan ber xwe

Bırın dan Avdıla Paşa  
Standın Zêr, Ziv û yasa(bıji)

Dûra sîre hate Şahan  
Raneza bû roj û mehan

Bırazi ê wi nav Pırço  
L1 dest wi de, Tıfing û Ço

Pırço got"Apo tu raze  
Ez dıdım te, sond û soze

Qet teyreki derbaz nekım  
Binhêrın, dorberê sekım

Ev çend roje tu ranazi  
Tu Apê mın, ez bırazi

Palde tıstek tu hêsa be  
Ev çı xeme, çı hesabe" .?



Şahan palda, ket xewa kûr  
Pırço kışand tıfing û Şûr

Kuşt apê xwe, seri jêkır  
Dılê hukma Romê şakır.

Hesenê kurmanê Şahan  
Bılez û bez, bı dıl kovan

Çû ku, ew Şahan bıbine  
Jêra bêje, wır nemin

Dit ku pısmam lı wê tune  
Got ez pırs kım, gelo kune

Got " Pırço ka Şahan Axa"?  
Pırço got "ew çû mala xwe

Hesen got em bıçine gund  
Rewş xırabe, qet nîne rınd."

Pırço, Hesen lı rê ketın  
Hewraz, tıran da daketın

Pırço lı pey dimeşiya  
Hesen lı xwe nehesiya

Lı geliyek kûr, tari da  
Pırço Tıfing, lı Hesen da

Hesen ji kust, seri jêkır  
Rûnıst dora xwe mêzekır

Herdu seri anin ba hev  
Xwinêde bûn, Simbêl û dev

Porên wan li hev girêda  
Avit ser mîl, tîrs, xofê da

Rêket ku, biçê Xarpitê  
Seran bîde hukumatê

Ew bêbexti li nav gel da  
Zû belav bû, gelek jan da

Kurdperweran pêşi girtin  
Ew Seg kuştin, rewş guhartin

Gostê wi dan, Teyr û tûran  
Bû xwarina Hîrç û guran.

Serdarên ser, bi wi tehri  
hatin kustin, jêbûn seri

Bî wê rewşê Tevger jar bû  
Hukma Romê Hîrç û har bû

Lesker beri da Xozatê  
Got"radest bin hukumatê"

Kurdperweran guhdar nekîr  
Qet keseki, ser xwarnekîr

Lî cih rabûn, derketin der  
Hember dijmin, ew ketin ser

Sekvanên Kurd berxwe dıdan  
Xwin dirijiya, wan can dıdan

Şerdıkırın weka şêran  
Jın û Keç ji, li tev mêran

Jı bo Kurdistan'ek Aza  
Ew fermana Ali Rıza

Bı hezaran sêrên bê nav  
Hatın kustın bın roj û tav

Gernas, mêrxwasên Demenan  
Dıgotın"ya mayın, neman"

Bo war namûs cangori bûn  
Ketın Dirok, ew birnebûn

Dorbera Çiya'yê Tûjik  
Dijmın negot "mezın, qıcık"

Dest dijımın de, Tıfing û Şûr  
Şer jêdibûn, zarokên hûr

Keç, Jın, bûk ji ber neyaran  
Dıçûn ser Kevır, Zinaran

Jor de xwe diavıtın jêr  
Ku namûsa wan, nebe qılêr

Romê Zar, Zêç, dıkır çalan  
Diavıt Gol, Çem Newalan

Bı hezaran xenıqandın  
Çı ku ditın, ew şêlandın

Zıkên jınan, bı Şilf, kêran  
Vedıkırın, hember mêran

Gelo kure, gelo keçe  
Were kuştın, dıj Tırk neçe

Çêle ê Mar, bêt jehr nabe  
Hın pıçûke seri jêbe

Ew pızêzên çend mehini  
Beden çılmok, sor û xwini

Perçe-perçe dıkır dıjımın  
Dıgot"Kurde, neyarê min".

\*\*\*

Şeyit Rıza nûçeyên res  
Şand, ew bû xemgin, dılês

Wi wenda kır hevalên xwe  
Çar Şêr, Pıng, lehengên xwe

Şahan Axa û Ali Şêr  
Lı dıl dıket Xençer, Şûr, Kêr

Kalo êdi tenê mabû  
Tev zarokan lı şûn rabû

Çûn ketın nav Darıstan'an  
Dûrketın Gund, Şarıstan'an

Dıjmin dit ku Tevger nema  
Zeman wenda nekır hema

Nûçe şand pê Ali Rıza  
Got " were wir bıbe Aza

Bı hevra em çêkın peyman  
Navê Xwedê, soz û raman".

Seyit Rıza bı dılsari  
Pejırand ew pêşneyari

Hêvi nedit lı Cihan'ê  
Berê xwe da Erzıngan'ê

Seyit Rıza tev hevalan  
Derbaz bû Çem û Newal'an

Çû ser pire Mama Xatûn  
Pire ser lenger û stûn

Qaymeqam, Serdar û Vali  
Leşker gırtubûn her ali

Ew şêrên Kurd lı wê bûn dil  
Dafık bed bû, sıkıyan mıl

Dest û lingên wan gırêdan  
Bı peyvên pis, dûra lêdan

Dijmın ew bırın Xarptê  
Bervı Ben, Agır, Şiritê

Bêt pırsyari û bêt pırsin  
Kırın Zindan, wek har û din

Pışti çend roj bang wan kırın  
Dest gırêdan, gırtın-bırın

Şev tari bû, Esmān sayi  
Rewş Romê'ra bûbû şahi.

\*\*\*

Rayber dijmın ra bû rêber  
Ket pêşiya leşker yekser

Ku, ew hemû wê malbatê  
Bıde destê hukumatê

Lı nav Darıstan gerıyan  
Bın her Kevır, Dar, nêhriyan

Dıtın Zar û Zêçên Rıza  
Lı nav bêdengiya Xweza

Dijmın lı wan bombe barand  
Ew ocax bında temırand

Sêzdeh kes bûn, ew lı hember  
Lı nav wan de, xwiska Rayber

Ew ji tev Zar û zêçên xwe  
Bûn nêçira Xal, Bira'ê xwe

Ew bêbextê har û heywan  
Bû qetilkarê sêzdeh can.

\*\*\*

L1 meydanê Sêpi danin  
Kurê Seyit Rıza anin

Navê wi xort husên Reşik  
Weka Şêr bû, pırr ji xweşik

Ew lı hember çavên bavê  
Dardakırın, lı wê gavê

Romê yek-yek dardakırın  
Dûra gazi Rıza kırın

Seyit Rıza çû binê Ben  
Bêt tırs û xof, bı rûki ken

Got "wê rojek, bê gelê mın  
Ew bıstinın xwin, tola mın

Her bıji Kurd û Kurdistan  
Bımre hukma Tırk-Tırkistan"

Serê xwe kır helqa bı rûn  
Lıng kursi xıst, neyar mat bûn

Lı wê ew ji bû cangori  
Teyr û tûran kırın lori

Dûra dijmin lodek êzing  
Avit serhev, kır dorê Sing

Meit danin ser êzingan  
Cellat rabû lı ser lıngan

Ferman stand, Agır da ber  
Sewıtandın Beden, Ling, Ser

Bedenên wan bûn Ax, Xali  
Ax dan ber Ba, çû her ali

Armanc ew bû ku, turbên wan  
Jı bo Kurdan, nebın Nisan

Kesek turbên wan nebine  
Pırsnekın û nebên kine

Ew ji werge hatın kustın  
Tevger nema, kes nehiştın

Tenê kesek felat bûbû  
Ew ji Toxtor Nûri xwe bû

Can felat kır ew çû Şam'ê  
Xwedê lı wi bıke ramê

Sed hezaran sırgûn kırın  
Dêrsim vala, talan kırın.



\*\*\*

İcar sîre hat hevparan  
Qet guh nedan dost û yaran

Memık Axa ê Ariyan  
Mina segê ber deriyan

Mıroveki bejn kın, jar bû  
Hukma Tırk'ra dost û yar bû

Rojek Romê gazi wi kır  
Çıl neferên malê komkır

Bırın Xozat ew rêzkırın  
Lesker hemû gulle kırın

Du bûkên wi ji, du can bûn  
Pıtık zıkan de perçe bûn

Ew jin, zarokên bêt tawan  
Hatın kustın, dil bûn kovan

Lı wê ji çûn Cıvarıkê  
Xwedê o tu qebûl nekê

Ku bıbinın Bertal Axa  
Lı wê bıgrın nêçirên xwe

Bertal Axa'ê Xormeki  
Dıda dijmin Nan, Ka, Fêki

Dijmın ew jı pırr xeter dit  
Derê wi xıst, Koç û Kilit

Şêst û şeş neferên malê  
Leşker komkır, bire holê

Bertal Axa tev Zar, zêçan  
Kip gırêdan, hevra pêçan

Hemû dan ber Şılf, qırsûnan  
Kuştın mina har û dinan

Hemû hevpar wenda kırın  
Mal şewtandın, talan kırın.

\*\*\*

Dijmin gazi bêbext Rayber  
Kır, got" were rûne hember

Te dılsozi mera kar kır  
Dılê Kemal Paşa şakır

Nema êdi Şer û Tevger  
Bo te tune, çûyin û ger

Ew kesên ku gelê xwera  
Nebın yar bav, diya xwera

Xeriban ra qet nabın yar  
Dıvê nejin, ew keş tucar

Te jı bo Zêr, Ziv'ên Cihan  
Kuşt Ali Şêr, Pırço Şahan

Edi nema kar û xebat  
L1 Anqarê fermanek hat

Divê ferman êdi bêt ci  
Xwedê ji bê, ew nabe si"

Serbaz ferman da leşkeran  
Got"gîrêdın, bıgrın zêran"

Leşker rabûn ew gîrêdan  
Tev kifiri, leqem, lêdan

Şara reş dan ser çavên wi  
Dan ber Diwar qenc pısta wi

Qirin, hawara wi caşi  
Mırın dıdit, berçav, xwasi

Gulle berdan ser dılê wi  
Perçe-perçe bû canê wi

Jin Zarok ji hemû kuştın  
Qet keseki wi nehiştın

Dijmın dıgot"ev kes nejin  
Ku bımının, rojek bêjin

Kar-berên me neyên zanin  
Bedelên kar, neyên dayin

Romê Zêr, Ziv şuva stand  
Kar û berên xwe qenc qedand

Gelê Kurd Rayber birneke  
Navê wi zarokan neke

Ev hosiya Kurdperweran  
Dîvê birnebe tucaran.

**Si û Sê Guleyên  
Dijmîn - 1943**

Faşist general Mûxlali  
Komkır hesen, Memed, Ali


Sebeb ji ew Kurdperwer bûn  
Lı ser dozê baş şiyarbûn

Wi si û sê Kurdên bijar  
Da pêş Tomson, Tıfing, Seşar

Cangori bûn ew lı Vanê  
Kurd birmekın qet wê janê.



Qazi Mihamed



Qazi Mihamed

**Komara Mahabet'ê û**  
**Xurandîna Komar'ê**  
**1946- 1947**

Hezar neh sed û çıl şeş  
Lı Mahabat, rojek xweş, ges

Hezaran Kurd ketın meşan  
Tev Qazi ê mêrxwas, rêşan

Doz kırın wan, war, cihên xwe  
Çand, Zargotın, Zımanên xwe

Gotın "ev erd warê meye  
Mırata bav-kalên meye

Em naxwazın bîjin bındest  
Eva daxwaz, eva mabest"

Lı wê sazbu Komarek nû  
Dıjmin şuva kışıya çû

Hat bıjartın Serok-komar  
Tev weziran rabû sond xwar

Ew kes Qazi Mihamed bû  
Zana, Leheng, ew şervan bû

Pırr aciz bûn dıjminên har  
Şahê faşist, ew Kuremar



Eriş dan ser Mihabatê  
Nûçê gihîşt Mûş'ê Sêrt'ê

Gund û bajar şewitandin  
Xwîna hezaran rîjanrdin

Sah xurand ew Komara nû  
Got"bikujin Serokan zû"


Lî meydana Çar Çıran da  
Pêş çavên xwişk, bav-bıran da

Serokên Kurd darda kırın  
Komar lî holê rakırın

Sebeb jî İngilîz, Sovyet  
Bî destên wan Tevger binket.



Mistefe Barzani



Mistefe Barzani

**Pîşti Salên 1950' an  
Kurdîstan'a Îran û Iraq**

Rewş xîra bû Iraq, Îran  
Lî welatê bav-bapiran

Du Dewletên har û barbar  
Çûn ser Kurdan wek gurên har

Lî tev Top û tev firokan  
Ketin xwîna Jin zarokan

Sê xwinmijên hov, koledar  
Lî nav xwe de girtin bîryar

Patkê Bexdat, Patkê Sento  
Wek Varsowa, weka Nato

Ew lî hember pîrsa Kurdan  
Demezrandin, wan namerdan

Rewşa Kurdan ket xeterê  
Xwin heriki lî her derê

Dijmîn xurt bûn, lî ba hev bûn  
Dost û yarên Kurd tunebûn

Dijmînan nedîdan eman  
Pêşmerge ji bêt havîl man

Ditîn ku qet sernakevîn  
Gotin "divê em birevîn"

Pêncsed şervan ketın riyan  
Derbaz bûn ser Zinar, Çiyan

Yar ditın wan hukma Sovyet  
Dijmın tev ceşan pey wan ket

Pênce du roj ew meşiyân  
Lı Sovyet de xwe hesiyân

Stalin ew belav k'ırın  
Yek û yek hev, cûda kırın

Serok Mele Mıstefa bû  
Dıxwast dagere welat zû

Danzdeh salên dûr û dirêj  
Lı Sovyet de ew kırın gêj

Dûra dageriyan welat  
Disa şer bû, wan ra xelat

Mêrxwas Mıstefa Barzani  
Tev Qasımlo, Talabani

Ketın nav gel, gel rêzkırın  
Bı milyonan şiyar kırın

Gotın"erdê me Kurdistan  
Em felat km wê bın destan"

Pêşmerge derketın çiyân  
Gund û Mezre, li her çiyân

Canfidayên mina şêran  
Doz parastin weka mêran

Lî nav deştan, lî ser kaşan  
Hember dijmin, hember caşan

Wana gelek erd Azad kîr  
Dilê Kurdperweran şakîr

Roj hat hêz lî hev cûda bûn  
Bûn dijên hev, bî salan çûn

Bîran xwîna hev rîjandî  
Kurdistan tevda hêjandî

Bî wî tehri, wî hewa î  
Dibûn nêçir bî hêsa î

Wana nexwast hêz bîbîn yek  
Gelê Kurd dîlsabe carek

Bî ramanên hev cûda î  
Qet lî hevdu nebûn xwe î

Hinek bûn çep, hinek bûn rast  
Şaşîti nekîrîn serast

Hîna ku nebûn Humanîst  
Bûn Şosyalîst, bûn Kominîst

Kî Maoîst, kî Leninîst  
Gel sîfte ev nav dîbîhist

Sazûmanek nû itopik  
Xwastin çekin, wê binin pêk

Her yeki cûreki welat  
Dit tehlil ki, tev Rojhûlat

Bona ramanên hevcûda  
Xwin rîjandîn, can bûn fida

Ders bûyeran dernexistîn  
Bêt şerm, fedi hevdu xistîn.



Dr. Abdurrahman Qasimlo

Sazûmanek nû itopik  
Xwastin çêkin, wê binin pêk

Her yeki cûreki welat  
Dit tehlil ki, tev Rojhulat

Bona ramanên hevcûda  
Xwin rijandin, can bûn fida

Ders bûyeran dernexistîn  
Bêt şerm, fedi hevdu xistîn.



Dr. Abdurrahman Qasimlo



**Bûyera Çıl Nehan**  
**1959**

Hezar nehşed pênce nehan  
Ew bûyera çıl û nehan

Çıl neh Ronakbir û Serwext  
Hemû komkır Roma bêbext

Kır Zindan û girtixanan  
Bı salan û roj û mehan

Bm êşkence, zılm û lêdan  
Çend kes kuştın, yê dın berdan

Romê ew kırım bın çavan  
Bı salan û roj û şevan

Nehiştın ku, Kurd ji rêzbın  
Lı ser doza xwe şiyarbın

Lê disa ji, Rom serfiraz  
Nebû, nehat cih ew daxwaz

Lı her derê Kurd qenc rêzbûn  
Gelek Komel, Partî sazûn

Bı roj û şev xebat kırım  
Diplomasi pêşve bırım

Ew Çıl Nehe kesên bijar  
Pûç kırım kar-berên neyar


Doza Kurd ket encamek nû  
Cihanê ji Kurd naskır zû

Xebatên wan Kurdperweran  
Vala neçûn qet tucaran.

DAWI




Hêja û nemirên Kurdistan






Hêja û nemirên Kurdistan





Çend hunerên Hunermendên Kurd, li Melbourne









Çend hunerên Hunermendên Kurd, li Melbourne











Wêşanên Dêrsim

1992 MELBOURNE